


Li dora girê ku Serkaniya Giştî rojnamevan biribûn û li ser serkeftina xwe daxuyandibû, roja 4'ê pûşperê helikopterek ket. Yarbayek, du binbaşi, yûzbaşiyek, çar üstteğmen, du astsubay û leşkerekê di helikopterê de mirin. Serkaniya Giştî wekî sedema ketina helikopterê dîsa arizeya teknîk nîşan da. Lê tê gotin ku helikopter ji hêla gerilayan ve bi moşekan hatiye xistin. Piştî daxuyaniya artêşa tirk a li ser girekî Zapê Serokê PKK'ê dabû zanîn ku gerila ji herêmê venekişîne, wê di nêzik de hêza xwe nîşanî leşkeran bide. Li gorî agahiyên hêzên gerila dest bi êrişeke mezin kirine û gelek cih bi dest xistine.



Helikopterek bi 'arizeyeke teknîkî' hate xistin!

HEVPEYVÎN:

Sûcê wan kurdbûna wan bû

Rûpel 8-9

ZANA SERIN:

NATO û gladyo ya wê li pey çî ne?


Rûpel 6

HALIL ATAC

Em di şer de her dem serkeftî ne

Rûpel 15

NAVEROK



Roşen Lezgîn: Tarîxa Kurdan: Qehremanî û xayînî

4



Şahiya Înstîtuya Kurdî

7



Ciwanê HADEP'ê xeftiyayane xo kenê vêşî

11

Ji Xwendevanan

PÊŞMERGEYÊN ku ji şerê Seddamê hov reviyabûn û hatin Bakur, bi rastî jî tevayî gelê Bakur ji wan re hembêza xwe vekirin. Heta roja ku li Bakur man gelê Bakur nanê xwe, bi wan re par kir. Careke din dema ku PDK û rejîma Baas a hov ku di sala 1974'an de şer dikirin bi hezaran xort û ciwanên me yên welatparêz çûbûn alîkariya wan.

Ger şerekî wan û dijminên kurdan hebe emê careke din herin piştevaniya wan. Lê, mala Barzaniyan îro wekî xerçerek reş bi îxaneta xwe di nava dilê gelê me de çikîyane. Tiştên ku dijminên hov bi me dikirin, îro mala Barzaniyan dikin. Nexweşan, hozanan, nivîskar û rojnamevanan, jinan û kesên bêçek dikujin. Wê ev hesabê giran miheqeq ji wan bê xwestin.

SİNAN AYDIN

DEWLETÊN faşîst her dem dibêjin ku kurdî ne zimanekî girîng e, jixwe tenê ji tirkî, farisî û erebî pêk hatiye. Li dijî vê em kurd çima xwedî li kovar û rojnameyên xwe dernakevin. Ew bi xwîna şehîdan, bi xebatên şervanan û bi pêreyên hindîk û xebatên mezin derdikevin. Dewleta faşîst û dagirker li hemberî dewletên ewrûpî û komalên însanî dibêje: "Kurdî ne qedexe ye. Zordestî tune ye; lê belê kes naxwîne. Binêrin dewletno, ezîno, Azadiya Welat derdikeve, NÇM dixebite; her tişt azad e, zordestî tune ye. Em dewleteke demokratîk û laîk in."

Lê gava ku mirovan binçav dikin, Azadiya Welat datînin ber wan û dibêjin ev weşan û sazîyên PKK'ê ne.

Pêwiste em dewletê derewîn derînin, a rast çî ye em wê derxin holê.

GÖKHAN İMER



Guherbariya wateya têgihan û lihevkirina neteweyî

SAMÎ TAN

Tu peyv û têgih bi serê xwe li derveyî dem û cih nayê nixrandin. Her gotin li gorî mercên dema xwe divê bê nixrandin. Wateya têgihan li gorî civakan jî diguhere.

Wekî nimûne mirov dikare li ser wateya peyva "lihevkirina neteweyî" raweste. Di civakên kapîtalîst de serdest li çî cihê ku dikevin tengasiyê, qala "lihevkirina neteweyî" dikin. Dema mirov guhê xwe bide serdestên tirk, mirov dikare vê rewşê bi awayekî zelal bibîne. Lê her wekî serdestên welatên kapîtalîst, desthilatdarên dewleta tirk jî hemû çînan temsîl nakin. Ew dixwazin gel ji bo çareserkirina pirsgerêkên xwe li dor xwe bicivînin. Ango ku mirovên kedkar ji bo berjewendiyên xwe bi kar binin. Ji bo pêkanîna daxwazên xwe jî heta ji wan tê berjewendiyên xwe wekî berjewendiyên hemû civakê nîşan didin.

Ew kes bi vê yekê bi riya bandora

bîrdoza xwe pêk tînin, lewre her kes dizane ku desthilatdarî bi tene bi çekan nayê parastin. Belkî mertalê herî zexim ji bo parastina desthilatiyê, bandora vê bîrdozê ye. Ev îdeolojî çînen kedkar ji hêz û şîyanê dixê, bi wan dilîze.

Hin caran rewşeke wisa derdikeve holê ku hinek kedkar bi destê xwe hefsarê xwe didin destê neyarên xwe. Bi vê yekê jî namînin xwe di ber neyarê xwe de didin kuştin. Heke pêwîst bike berjewendiyên kedxwaran li dijî wan bi xwe jî diparêzin. Bo nimûne kedkarekî ji MHP'ê dikare êrîştî yekî mîna Sakıp Sabancı bike, ji ber ku wî qala aştîyê kiriye. Ew bîrdoza ku em qalê dikin li welatên dagirker û metingehkar şovenîzm e û dirûşma sereke ku vê bîrdozê îfade dike jî "lihevkirina neteweyî" ye.

Li aliyê din dema tevgera azadîxwaz qala yekîtiya neteweyî

dike ku ew gotin jî ji aliyê wateyê ve nêzî "lihevkirina neteweyî" ye, tiştêkî din tê fêmkirin. Lewre tevgera azadîxwaz bi giştî li ser berjewendiyên gel lihevkerinê dixwaze û ew yekîtiyê wê doza neteweyî xurt bike. Ji ber ku gelê kurd di nav raperîneke neteweyî de ye û berjewendiyên piraniya civaka kurd di warê bilindkirina doza neteweyî de digihe hev.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku ji bo kurdan rast e ku li dor tevgera azadîxwaz a kurd bicivînin, li ser doza neteweyî yekîtiya xwe pêk binin û li dijî dagirkeran derkevin. Lê li Tirkiyeyê lihevkirina neteweyî ji bo berjewendiyên rejîmê ye. Tirkên ku bi rastî azadiyê dixwazin, nikarin li vê dirûşmê xwedî derkevin. Ew bi tenê dikarin bilindkirina ala rizgariya kedkaran bixwazin.

Ew kesên ku qaşo ji bo berjewendiyên "neteweyî" li dor MGK'ê dicivînin jî, yên ku doza neteweyî ya gelê kurd wekî şovenî bi nav dikin jî, dûrî rastîyê ne û alîkariya rejîmê dikin. Bi qasî kesên ku xwe didin dor rêxistinên zordestan, kesên ku li dijî yekîtiya neteweyî ya kurdan û pêkhatina bereyeke azadîxwaz xebatê dikin jî alîkarên rejîmê ne.

Çepgirên tirk û berxwedana me ya pîroz

KAWA NEMIR

Ji şaneşîna (balkon) Rojava, zêdebûn an jî kêmbûna hêz û bandora tevgera gelê kurd a neteweyî ma qey mîna aveke şêlî, mîna behreke peng dixuye? Li gorî hin derdorên çepgir, tevgera kurd hin bi lûn hem ji aliyê piştigiriya alîgirên xwe, hem jî ji aliyê xurtbûna îdeolojiya xwe ve dihele. Ev hêz û rêxistinên ku em qala wan dikin, jixwe re marksîst, lenînîst, şoreşger û hevalbendên tevgera kurd dibêjin. Belam ji bo ku ew hê jî di bin bandora kemalîzmeke "nuxamî" de ne, ji wan ê ku herî şoreşger e jî piçekî bêhna bandora bîrdoza fermî tê.

Çima şêlî, çima peng? A rast ew e ku gelê kurd heta jê tê hewl dide ku dijminên xwe û hevalbendên xwe roj bi roj û jî serdanpê binase, binirxîne. Ligel dijminê har, ewên ku em jê re hevalbendên me ên xwezayî dibêjin (an jî em hevalbendiya wan ji bo birayetiya gelan mîna merceke girîng dibînin) çepgirên marksîst-lenînîst, xwediyên mîrata şoreşgerên daleqandî, ev nêzîkî mehekê ye ku bi zimanê se û dêleseyên har diaxivin. Ji bo ku em belavok û kovarên rêxistinên wan dişopînin, em dibînin ku hê jî mijara van a sereke nixrandinên deldirêj in. Pir dirêj dibêjin û dinirxînin,

Li şûna silavkirina li Vietnamê ku ji mêj ve hatî, bi pênûsên xwe astengên ramanî derdixin. Belam bi nêzîktêdayînên wiha ên wan em hevalbendên kurd û Kurdistanê pir baş dinasin.

belam ji xeynî dîtî û rexneyên 'zirav' tiştêkî nakin. Divê bi du mînakên em van rêz bikin.

Rojnameya bi navê 'Emek' di nivîseke xwe de, der heqê kêmbûna hêz û alîgirên Tevgera Rizgariya Neteweyî a Kurdistanê de hin dîtînen tirkên çepgir diyar kiribû. Li gorî wan rêxistinên, tevgera kurdan êdî nikare mîna berê têbikoşe; hêza xwe ya berê winda kiriye û êdî bi bandor nîn e. Di cihê xwe de rûniştine wisa hest dikin. (Dibe ku dixwazin ku wisa bibe) Li gorî wan hêza nûnerê kurd ên ku bi mirinê, bi xwînê hişyar bûn, her roj dihele.

Rêxistina bi navê 'Ekim' jî bi heman awayî di belavok û kovarên xwe de têkçûna şoreşa kurd (bi hêdî hêdî windakirina hêza xwe) bi sedemên wekî reformîzm, aştîxwazî, daxwaza çareseriya kêşeyê bi riyên siyasî û hwd. şîrove dikin. Li gorî wan, tevgera kurd pir li ber xwe da, pir şer kir û êdî di vê qonaxê de betilî, ji hal ket. (Li gorî wan êdî bi paş ve dihere.)

Halê hevalbend û birayên me bi vî rengî ye. Lê destpêkirina dîtînen wiha

nemaze piştî dagirkirina başûrê Kurdistanê bû. Pêncî hezar leşker, bi hezaran cehş û hestîkoj, hêzên paşverû, serokê împeryalizmê DYA ma qey çavên wan tirsandin. Dixwazin bi lêv bikin ku gerîla dê nikaribe têbikoşe. Li şûna silavkirina li Vietnamê ku ji mêj ve hatî, bi pênûsên xwe (zanatî an jî nezani) astengên ramanî derdixin. Belam bi nêzîktêdayînên wiha ên wan em hevalbendên kurd û Kurdistanê pir baş dinasin. Jixwe di axaftin û danûstandinên me ên bi wan re de, dem bi dem em leqayî pirsgerêka nasnameyî tînin. Li gorî wan ew tirk in (bi serbilindî dibêjin û rûyên wan diguhêrin!), em jî hê, 'Kürt Kökenli' ne. Li gorî wan tirk bi 'köken' nabin. Tirk tirk in. Lê kurd divê hemasa bi 'köken' û bi dêl bibe. Lê tu car kurd, kurdê bi xwe nebe. Di dawîya nivîsarê de ez ji we re gotineke yewnanî bihinêrin: "Siya we ne serma ye."

Ji ber ku me ji mêj ve biryar li dilê mirinê nivîsiye, van rojan em qala seferberîyê dikin. Em derbest (cîdî) in bi qasî dijminê ku qala tevkujiya kurdan dike.



DOZA ku ji ber daxistina ala tirk di kongreya duyemîn a HADEP'ê de, li di jî rayedarên HADEP'ê hatibû vekirin, gihîşt encama xwe. DGM'ya Enqereyê roja 4'ê pûşpera 1997'an Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozîak û Serokê HADEP'a Stenbolê Hikmet Fidan bi 6 salan û 28 rayedarên din jî bi 4 sal û 6 mehan ceza kir. Faysal Akcanê ku bi daxistina alê dihat tawanbarkirin jî 22 sal û nîv ceza girt. Her wiha dozger biryar da ku ji bo girtina partiyê serî li dadgeha bilind bike. HADEP'ê li ser vê biryara DGM'ê daxuyaniyek belav kir. Di vê daxuyaniyê de ev biryar wekî biryareke siyasî tê destnîşankirin. Li aliyê din parêzerê HADEP'ê Yusuf Alataş da zanîn ku ewê biryarê temyîz bikin, lê heke ji dadgeha bilind jî encamêkê bi dest ne-xin, ewê dozê bibin Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê.



CEMİYETA Rojnamevanên Tirkîyeyê (TGC) bi daxuyaniyê nivîskî da zanîn ku di meha gulanê de jî êrîş û kotekiyên li ser çapemênî û rojnamevanan kêr nebûye, lê zêde bûye. Di daxuyaniyê de tê gotin ku meha borî 8 rojnamevan hatine binçavkirin, 4 avahiyên TV'yan hatine gulbarankirin, der heqê 5 rojnamevanî de jî doz hatine vekirin.

Her wiha TGC bi bir dixe ku tevî rojnameya Demokrasiyê 3 rojname hatine girtin, der heqê 4 rojnameyan de jî doz hatine vekirin. Di daxuyaniyê de bi taybetî li ser cerda ser Flash TV, Êrîşa li ser ATV û Rojnameya Hürriyetê tê rawestîn.

NÜÇE

Helîkopterek bi 'arizeyeke teknîkî' hate xistin

Li dora girê ku Serkaniya Giştî rojnamevan biribûn û li ser serkeftina xwe daxuyandibû, roja 4'ê pûşperê helîkopterek ket. Yarbayek, du binbaşî, yûzbaşiyek, çar üstteğmen, du astsubay û leşkerekê di helîkopterê de mirin. Serkaniya Giştî wekî sedema ketina helîkopterê dîsa arizeya teknîk nîşan da. Lê tê gotin ku helîkopter ji hêla gerîlayan ve bi moşekan hatiye xistin.

Di pêngava duyemîn a şerê li başûrê Kurdistanê de, li gorî agahiyên ku bi dest ketine, hêzên AGRK'ê dest bi êrîşeke gur kirin. Tê gotin ku piştî van êrîşan gerîlayan hinek girên ku artêşa tirk bi helîkopteran rojnameger birine ser jî tê de, gelek çeperên artêşa tirk bi dest xistine. Dîsa li gorî agahiyan roja 4'ê pûşperê helîkoptereke Cougar ket û 11 serbaz û leşkerên tê de mirin. Kesên ku di helîkopterê de 8 heb jê subayên bi rutbeyên bilind in. Li gorî daxuyaniya Serkaniya Giştî ew helîkopter jî wekî yên din ji ber arizeya teknîk ketiye, lê tê gotin ku helîkopter bi moşeka gerîlayan hatiye xistin.

Li aliyê din di qada navneteweyî de berteka li dijî dagirkerîna her diçe zêdetir dibe. Bi taybetî welatên ereb li hemberî vî operasyonê gelekî zivêr in û vekîşina hêzên tirk dixwazin. Hevalbendiyên Amerîka, Îsraîl û Tirkîyeyê dewletên herêmê bêzar dîke û dibe sedem ku ew jî li hemberî vî hevalbendiyê, tîkiliyên xwe xurtir bikin.

Her wiha welatên ewrûpî jî her çiqas li dijî tevgera dagirkerîna reaksiyoneke tûj nîşan nedin jî, dilsariya xwe dinimînin. Dîsa ew bi zîmanekî vekirî didin zanîn ku operasyonên bi vî rengî bi ser navêkin û kêşeya kurdî tenê bi riyên siyasî

çareser dibe.

Wezîriya Karê Derveyî yê Tirkîyeyê guhê xwe ji gilî û gazinên wan welatan re girtine, hêviya xwe bi Amerîkayê ve girêdane. Lê hinek nivîskarên tirk di xeternakiya rewşê gihîştine û didin zanîn ku dewlet bi vî polîtîkaya xwe reaksiyona welatên herêmê dikişîne. Li gorî nivîseke M. Ali Birand welatên ereb yeke-mîn car qala "kuştina kurdan ji hêla tirkan ve" dikin.

Bi qasî ku ji manşetên rojnameyên tirk tê fêmkirin, artêşa tirk bîngeha vegere jî xwe re amade dîke. Lewre li aliyekî tê gotin ku li dora kampa PKK'ê helîkopter ketiye, li aliyê din dibêjin ku li herêmê PKK'yî neman. Wisa xuya dîke ku generalên tirk dixwazin di zûtîrîn demê de, berî ku rîya vegera li wan bê girtinê ji herêmê vekîşin.

Lewre jî her çiqas mebesta operasyonê wekî pêkanîna serdestiya PDK'ê li herêma behdînan, hatibe daxuyandin jî, êrîşan dibin ser herêma soran jî. Li gorî daxuyaniyê YNK'ê, balafirên tirk herêmên Bote, Warte, Dole-Xaneke bombebaran kirine, di vî bombebaranê de 7 jî wan sivîl, 9 kes mirine. Li ser vî bûyerê YNK'ê daxuyaniyê belav kir. Di vî daxuyaniyê de vekîşina artêşa tirk tê xwestin. Berpîrsên YNK'ê di daxuyani-

yê de dane zanîn ku dawî li vî tevgera dagirkerîna neyê, wê diwarojo peyman a aştiyê bikeve xetereyê.

Tê gotin ku roja 28'ê mehê li herêma Begovayê û li Kumriya ku dikeve rojhilatê Metîna hêzên PDK û leşkerên tirk ketine kemîna gerîlayan. Li wir şer derketiye û di şer de 4 leşker hatine kuştin. Gerîla tu xesar nedîtine. Dîsa di heman rojê de li Spîndar û Çiyayên Heftabakê şer derketiye, di şerê Spîndarê de 4 leşker û li Çiyayên Heftabakê jî subayek û uzmançavuşek jî di nav de 7 leşker hatine kuştin.

Li gorî agahiyên ku çavkaniyên xwe-cihî didin, hêzên gerîla bi çekên giran êrîş birine hêzên tirk ên ku li Deraluk û Sergeliyê bi cih bûne. Tê gotin ku gerîlayan agir berdane 5 erebeyên leşkerî, konekî ku leşker tê de diman jî şewitandin. Dîsa tê gotin ku cendekê 6 leşkeran û 8 leşker, 10 cerdevanên birîndar anîne Nexweşxaneyê Şîmexê ya Dewletê. Li aliyê din hêzên ARGK'ê li Tenduruka ku dikeve nava herêma Barzan êrîş birin ser girekî ku hêzên PDK'ê li ser bi cih bûbûn. Piştî êrîşa gerîla PDK'yî dest ji wir berdan. Li ser xesara ku gihîştîye PDK'ê tu agahî bi dest nekin. Tê gotin ku cendekê 3 pêşmergeyan û 9 pêşmergeyên birîndar rakirine nexweşxaneyên li Duhokê û Amediyeyê.

Çalakiyên ARGK'ê yên li bakurê Kurdistanê jî didomin. Li gorî agahiyan gerîlayan roja 30'yê gulanê li Gencê êrîş birine ser binecihekî tîmên taybet. Di vî êrîşê de du tîmên bi navê Abdullah Kanat û Hasan Hüseyin Aydın hatin kuştin, tîmek jî birîndar bûye.




Di destpêka meha pûşperê de li dora Çiyayê Prîz û navçeya Bamişmiş di navbera gerîla û hêzên PDK'ê de şerên giran derketine. Çavkaniyên xwe-cihî didin zanîn ku PDK'ê piştî êrîşa gerîla cendekên xwe jî li cih hiştine û ji herêmê vekîşîye. Tê gotin ku gerîla cendekên wan berhev kirine. Her wiha gerîla gelek jî melzeme bi dest xistine.

Li aliyê 70 pêşmergeyên ku li herêma Xakurk û Haftanîne hatine kuştin û birîndar bûne, birine Diyanayê. Cihêkî din ku lê bi gurehî şer derketiye jî girê Şoreşê yê Haftanîne ye. Li wir piştî şerê giran ê gerîla û hêzên tirk, hêzên tirk ji herêmê vekîşin. Li ser ku xesara gihîştîye artêşa tirk tu agahî bi dest neketin.

Li herêma Zapê jî di navbera leşker û gerîlayan de şer didome. Di lihevixistinên li vî herêmê de 2 leşker birîndar bûne û 3 cerdevan jî di ketine destê gerîlayên ARGK'ê. Cerdevanên ku ketine destê gerîla ev in: Sadullah Tekin, Halit Temel Kehe û Salih Kurt. Gerîlayan êrîşa bir ser konvoyeke leşkerî ku xwarin û cebîlxane dibirin Etrûşa ku tê de leşkerên tirk bi cih bûne. Tê gotin ku di vî êrîşê de ji 50 erebeyên leşkerî, du heb jî hêla gerîla ve bi temamî hatine rûxandin.

Her wiha hate gotin ku gerîlayan rîya navbera Çewlik û Gencê û rîya navbera Sêrt û Misircê jî birîne, nasname kontrol kirine.

NAVENDA NÜÇEYAN



Tarîxa kurdan: Qehremanî û xayînî

Tarîxa ma kurdana qehremanî mîrxasî û xayînî xemelnayîya. Qehremanî û xayînî, di çêkê dijberê yewbînanê. Serî ke tehlî û şerîni, siya û sipey, tarî û roşnî, raştî û zûrî yewbînan ra berevajî yê, yewbînan ra çep û dûriyê, qehremanî û xayînî zî o tewr yewbînan ra dûrî û dijber ê.

Gama, ma ageyrin, banîn tarîxa xo ra, ma go bivînin ke; bi se hezaran, bi milyonan merdimê ma sebê dozê kurd û Kurdistanî, sebê azadî û xoserîna (serxwebûn) şarê ma înan, weşîna (jiyan) xo miyan de gelek zor û zehmetî de, perîşanî û hejarî de viyamawa. Heta nefesê xo ya peyîn, heta çilkê gonî ya xo ya mendî sebê welatê xo, xo ver dawo. Viranî, veyşani, serde-seqem, germ, nêweşî, dirbetînin (birîndarî) eşkence, tehda, zilim, zindan, îdam înan ra nêaçaryawo. Bi hezaran qehremanî û ciwanmêrdî tanê tewênawo. Badê serewederman, şer û xo ver dayinan de esîr kewtê destê dijminanê hovan û dijminan wehşetîn, barbarînan û înan rê zindanan de eşkence kerdê. Înan zî, bi qasê serê derzîni zî, bi qasê mîlimek zî bawerî xo ra tepiya linge nêesta. Û zey pêxembera ê ko bi wehî jê Homay wa giredaye bê, ê zî dozê xowa girêdayî mendê. Gama, dijminan bi awê ko neheq û bê pawîten di mehkeman ê xo yê zureyînan de darizney û kindir eşto qirikê înan, hewna înan bi egîdî, bi mîrxasî û bi lengî di vatê xo ya peyîne de sebê mîletê xo şurê xo, fikir û dozê xo, reyê xoserînan û azadî, sere hewanayînan û xoverdayînan ma rê wesî kerda.

Camêrdan zey egîdan, bi biryar û bi bawerî vatê xoya peyîne de wayirveciyayîne dozê kurd û Kurdistanî û xoverdayînan ma temî kerde. Gama kindir kenê qirikê şehîd Şêx Seîdî, vano:

– Ewro peynî jiyane min a. Ez sebê mîletê xo bona qurban, ez poşman tî ya. Bes ke wa torîne ma, ma vernî dijminan de şermende nêverde. Heyfê biza kole a xilocîne rê nêmanena.”

Şehîd Dr. Fuad zî vano

– Ez tim fikirreyne ke; ez sebê welatê xo bibî qurban. Bêşik, di serê enê erdî ke ez aleqeyena, go mehqem rojek alê xoserînan biyo berz.”

Tewfîq Beg (Bavê Tûjo) vano

– Cenekê min pêro yê bin ya nişan bide. Wa her kes bizano ke ez sebê şexsê xo nê, sebê welatê xo şer kena. Bijî Kurdistan.”

Kemal Fezî, Seyîd Abdulqadir, Salih Begê Hênî, Şêx Şerîf, Talix Elî yê Çewlîgî û qehremanê zey înan serê xo verê dijminî de nêtewênênê û xo resnenê mertebê şehîdan. Jiyane înan ke, bi hes-

retê azadî û xoserîna kurd û Kurdistanî xemelnayîya, ma rê mîras viradayê.

Serehewanayîne Amede ke di binê sermiyanî Şêx Seîdî de dest pê kerdî, demêko kilm de xeylê cay konê destê kurdan. La belê, dewleta rome bi hetkerdîşê ewrûpayîyan êrîş benê ser û serehewanayînan ki peleşeno, Şêx Seîd bi tevlê embazanê xo wazenê bi vêrê şê hetê rojhilatî û hewna dest bi xoverdayînan bikerê û şerê ko newe birêse. A game, Qaso (ke o zî sermiyanê ke eşîrê Cîbrani yano, û bacenaxê Şêx Seîd yo.) xwere riseno artêşê tirkan. Şêx Seîd bi tevlê embazanê xo, serê pirdê çar bi xayînî nêkerde, çirey zî dijmin nê eşkayne sermiyan û qumandaran ê kurdan tepîşî. Belkî, serehewanayînan badû cûy biserkewtêne zî.

Şêranê Dêrsimî û îxanet

Tarîxê ma kurdan de Dêrsimî cay ko taybet de wo. Dêrsimî, berê Kurdistanî o sîmîn o. Koyanê Dêrsimî, koy Munzurî (ki di hewran dir, ezmanî der serê ançenê) û warê Seyîd Rizayan, Elîşêran, û Zerîfe Xatûnan û bi hezaran şergelanê tarîxê ma de çirey dijminanê kurdan rê serê nêtewênayî bi û ê nêşinasnayî bi. Ger xayînî ra nebeyna, bekî heta bi heta zî agu nêşinasnê zî. Di serehewanayîne Qoçgirî û Dêrsimî de dijminan se qat zêdeyê kurdan teqet şirawito înan ser, la belê, remayînan û hezîmet tim biyo barê dijminan. Gava, koyê Mûnzûrî hêrsê xo virito, zarê dijminan qerefiyawo. Top û tîfingê xo warde verdeyê û remê-rem ageyreyê.

La îxanet pawê çî rocê yo?

Rêber, birazê Pîrê Welatî Seyîd Rizo-yî wo. Di wextê serehewanayîne Dêrsimî de o zî di dewê Peyamî ay Xozatî de rûnişte beno. Di vernî serehewanayîne de xo bêhetî îlan kenê. La belê, binîdir hisawê dewlete ser xewetêno. Artêşê tirkan, se kena zî rê eşkena rover şo û serehewanayînan bişikino. Rêber, o xayîn û bi tevlê ambazê xo Efendî planan û dûlawanê xayînan rêsenê. Rêber û ambazê xo şinê risenê miyanê eşîrê Bextiyaran (ki êzî qehremanê xoverdayîni yê) Ez poşman a, min hendî zana ku Rom xayîno. Ez wazena bi to het û lew destê to wanî. Dewlete zî ke bi Rêber î dir şirkê ena plana xoyîne wo xewere kena, vila kir: “Rêber rema wo, şiyê hetê şarê xo.” Rastî zî ena xewere ebi meqsed e. Seyîd Riza zî fam kenê ke çik di binê Rêber û xayîn nê eşkno xo birisno Seyîd Riza jî. Şino Elîşêr bar. Elîşêr (zek şima zî zanê, qumandarê serehewanayîne Qoçgirî bi) û di xoverdayîne Dêrsimî de zî hewna ta amey çî? Rêber zî vano: “Ez biya veyşan, ez wazena nan bûrî û şîrî. Elîşêr, yama ci rê nan hedemeno, Rêber, pey ra bi



bêbextî nano pawa. Şêrê çêran qumandara pîl, welatparêzo mîrxas Elîşêrî Şehîd kenê. A game, dayikê şêran, rûmetê û sembolê cimî kurdan cimî Elîşêrî, Zerîfe Xatûn zî demange encama nana Rêber û Efendî wa. Rêberî birîndar kena û Efendî zî kişeno. Rêber o xayîn nano Zerîfe Xatûn wa zî û a ye zî şehîd kenê. Serê wîrdine terakena û beno Xozat de dano dijminî. Rêber o xayîn, herûndê enê îxanetî de qutîkê çixara a zerîne, tîzbêk û sozê yew çîftligê înan ra gêno. Herê birano. Rêber welatê xo, şarê xo bi enê qerpalan raşeno.

Hewna di a wext de sermiyanê eşîrê Bextiyaran (ke şahîno û o bi tevlê eşîrê xo miyanê xoverdayenî de yê.)

Bi rocana û şewan zey mîrxasan dijminî dir şer kenê. Şahînan badê ke bi rovan şer kenê, beno-riçan û wazeno qasêk bi-ko hewn. A game, Xidir o xoyîn hewn de ê qehremanî şehîd kenê. Xidir o xayîn zî, zey Rêberî serê şehîd Şahîni tera kenê û beno Xozat de dano dijminê apeyreno, birayanê şehîd Şahîni erzenê varnî. Xidirê xayînî û bi tevlê ê ku tedir benê pêri-

ne kişîne û cezê pê qedêno, dijmin bixorê kişeno û ê yerpalê ki day ci hewna tera yêne.

Herê birano! Badê enê îxanetan û bi gelek îxanet û xapênayîşan warê şer û egîdan, diyarê qehremanan Dêrsimî zî kuno binê linganê çêlê verganê Asena. Sembolê mêrdan, pîrê welatî, şehîdo bêmerg Seyîd Riza û bi tevlê bi seyan ambazanê xo yê egîdan, leheng û ciwanmêrdan yanê aleqayîş. Gama, kindir kenê qirikê şehîd Seyîd Rizo yî, vano: “Ez hewtay û panc serî wa. Ez zî hawa risena şehîdanê Kurdistanî. Go xortê ma (ciwanê ma kurdan) heyfê ma hewanê. Bijî kurd û Kurdistan.”

Qehremanî û mîrxasî vizêrî zî, ewro zî û ta dinya bibo yo bi heskerdene, bi minnet û bi hurmet biyê vîrî ma. Ma go tim rêçê înan birêsin. La belê, xayînan zî ta dinya bibo ma go her tim bi nefret biyarin xo vîr û nalet li înan bivarinin.

Çimêhîne:

Doza Kurdistan, Zinar Silopî Kurdistan
Tarihinde Dersim, Dr.Nûrî Dersimî

ROŞEN LEZGÎN

Banga gihandina şagirtan

Di Rojnameya Azadiya Welat hejmara 61'î de ji aliyê Roşan Lezgîn ve bangê ji bo xwendevanên vê rojnameyê hatibû kirin.

Di vê banga xwe de Birêz Lezgîn di de xuyan ku berî weşana Azadiya Welat, wî hema bigir kurdî ji bîr kiribûye. Sedema jibîrkirina xwe jî dide nişan ku çawa tê zanîn li bajar û metropolan jiyaye û mezin bûye.

Birêz Roşan dî re dide zanîn ku piştî, weşana Welat wî girîngiya zimanê xwe fêhm kiriyê û di berpirsiyaya xwe ya di vî warî de gihîştîye. Piştî wî biryar daye û zimanê xwe jî nû ve fêr bûye.

Di sa em ji nivîsa vî hevalî hîn dibin ku niha ew jî zaravayên kurdî dimilî û kurmançî heta gramera wan jî hîn bûye û ew difikire ku soranî jî hîn bibe.

Ev helwesta Hevalê Roşan ji aliyekî ve tişteke asan e û wezîfa wî ye. Lê ji alê din de di nav vê malkambaxiya me kurdan rewşa froyîn de, hewlesteke pirozkirinê ye.

Ev bang di çih de ye û ez bawer im ku wê cihê xwe bigire. Lê belê em dixwest ku hevalê Roşan bika-ribûya min jî bida kifşê ku ji xeynî xwe jî qet nebe yek, didu yê din jî hîn xwendin û nivîsandina kurdî kirine.

Piştî banga Roşan, em rastî bangeke din hatin ku di hejmara 65'an Azadiya Welat de hatibû weşandin.

Ev bang jî ji aliyê Birêz Çiya Mazî ve hatibû kirin û wî jî di eynî mijarê

de bi dorfirehî bîr û ramanên xwe ani-bûn ziman.

Birêz Çiya Mazî jî gelek mijaran rave dike, li ser pirsgrêkan radiweste û gelek pêşniyazan pêşkêşî me xwendevanan dike. Bi rastî ev her du bang jî hêja ne û di cih de ne. Îca ez jî li ser bangên van her du hevalan divêm banga sêyemîn bikim. Çawa ku dibêjin; qewlê Nebî sisê ne, em jî vê cara sisyavan dubare bikin.

Ez jî dibêjim gelî xwendevanên Azadiya Welat! Îro li rûyê vê dinyayê rojnameyê xwerû bi kurdî û xwedî bingeheke saxlem, mirov, dikare bibêje ku tenê Azadiya Welat e. Ji bo rojnameyê xwe yekê rojane Azadiya

pêserojê ye.

Divê em rojnameya xwe bixwînin ku kurdî hin bibin. Lê belê tenê xwendin û hînbûn a

vê ku, ev xwendevanên me şagirtê xwe tu car piştguh neke. Wekî ferza nimêjê ku çawa misilman li ser xwe ferz dibînin, ew jî vê wezîfeya xwe bişopînin. Bila bi kêmasî ev kampanya me salekê bidome. Heta her xwendevanekî/e me xwendevanekî/ê din nede kar kirin, bila dev jî vî karê xwe bernede.

Niha li ser vê bangê ez li ser navê xwe soz û peyman didim ku ji îro şûn de ezê vê bangê ji bo xwe biryar bigirim û heta dawiyê li ser soza xwe bisekinim.

Ev wezîfeyê pir biçûk e. Her xwendevaneke/î me dikare bi hêsanî vî karî pêk bîne. Tenê divê mirov zêde ne xemsar be.

E ku ji vê bangê re erê dibêje yê yekemîn va ye, ez dibêjim ez im û navê xwe di listeya vê kampanyayê de li rêza yekemîn didim nivîsandin. Heçî xwendevana/ê ku tevî vê kampanyayê dibê, bila ji kerema xwe re nameyekê bişîne rojnameyê û navê xwe di vê listeya kampanyayê de bide nivîsandin.

Ji berpirsiyarên Azadiya Welat jî daxwaza me ev e ku quncikekî ji bo listeya vê kampanyayê veqetînin û navê alîgirên vê kampanyayê di wî quncikî de biweşînin.

Ez hêvîdar im ku emê di vê listeyê de bi hezaran welatperwer bibînin.

Rêz û silav û serkeftin ji we gişkan re.

MIRAZ RONÎ



Gelî xwendevanên Azadiya Welat!

Werin em dest bi kampanyayekê bikin ku, bila her xwendevanekî ji me jî xwe re şagirtê/ê bigire û bila ev xwendevanê me her hefte dema ji xwe re rojname stand, yekê jî ji şagirtê xwe re bikire an jî heke derfetên wî yê aborî dest nadin, wê çaxê bila yekê bi şagirtê xwe bide standin. Lê belê îcar di-

diya Welat bo kurdan tecrube û nirxeke gelek giranbuha ye. Ev hem ji bo fêrbûn û pêşveçûna ziman û hem jî ji bo geşbûna hesta neteweyî hêviya

"Hûn nîjadeke ne baş in"

XURŞÎD MÎRZENGÎ



Alma-Ata di binê Çiyayên Altay de, li ser kaşekî hatiye damezirandin û dadikeve heya rasta binê bajêr.

Çiyayên Altay berz û bilind in û bi qorî û daristan in. Darên çeman di nava wê berfa sar û seqemî de jî keskahiya xwe naguherînin û mirov dikare bibêje, wekî kewê ribat li hemberî berfa çiyayên Altayê qibeqîbê dikin. Lê ew berfa zalim jî, şeş mehan dev ji wan dar û dêviyan bernade û wan hêsr û dil digire.

Havînan Çiyayên Altayê wekî Xambirpêtê, Bîlîcanê û Tekmîl Zozanên Serheda me sar û hênîk in, xuşexûşa avên sar û qerisî ye, bi paç û lehfen wê ve diherikin xwarê. Urîsan çandek biriyê wan deraf ku mêr û jin, keç û xort, misilman û fila tev, di şox û palên wan çiyayên de, li ser wan karîsarkan, xwarinê bê êraq û şerabê venaxwin. Ên ku xwe ji ber germa havîne diavêjin lehfe çiyayên, êraq û şerabên wan di kîsik û tûrikên wan de ne û hemû li wan deran serxweş dibin û hîna dizivîrin malê.

Goya qazax misilman in, lê bi serê min jî û bi serê we jî; nizanin desmêjê bigirin û

nizanin limêja sibê çend rîkat e.

Ez ji mala Apê Nadir Nadirof derketim, saet nehê şevê ye û heyam bîst derece di binê sifrê de ye. Di deh saniyeyan de simbelên min qeşa girtin. Te tûka xwe biavêta, li hewa dibû qeşa. Ew şeveke kezebrêş bû. Gîzgêrtikan di bêvîla mirov de çildidan derve: Li ser rê min destê xwe bilind kir, erebeyek vala hat li nik min rawestîya. Di erebê de ajo (şofor) û jinîkek hebûn. Ajo jî û jinîka kêleka wî jî pêncî salî hebûn. Her du jî qazax bûn. Got: "Qayda qaçîrsen?" Min got: "Arbêta Adîn e qaçîrem." Ez siwarê erebê bûm, hundir germ bû lê, bîhna alkolê mirov difetisand. Li derve ew serma nînbûya, mêrik bi ser de dirave jî bidana min, ez li ereba wî siwar nedibûm. Lê ji wê eyana sar a derve, ne bîna alkolê, bîna rêxê jî di nava erebê de hebûya, min dîsa jî deng nedikir.

Ajoyê qazax, ji min pirsî ku ez ji ku derê me. Min got: "Ez kurd im û ji Kurdistanê me." Min dît, mêrikê serxweş ji min re nebêje: "Hûn kurd nîjadeke nebaş in. Hûn nakin bi pênc peran..." Li hemberî wê gotina, wî serxweşî, bi carekê de kela dilê min rabû, hêrs di çiqrên eniya min de rûniştin û ez tîrş bûm. Heta hindik mabû ku ez bi wê hêrsê, bigirim seriyê mêrik, li cam û şibakên erebê bidim û wî geber bikim.

Lê min hêrsa xwe ragirt û bi awayekî nerm û bi papizkirinê min got: "Çima-axa? Heya îro me dest avêtiye namûsa kê? Mê qîzên kê û jinên kê yê bi mar revandine. Me terş û

keriyên kê dane pêşiya xwe û me birine? Me mal û mala kê talan û paymal kiriyê? Me çit û perdeyên konên kê tîş kirine û qetandine. Me gund û gomên kê kambax û wêran kirine? Me sûk û bajarên kê agir berdane û şewitandine? Ku emi nîjadeke nebaş in."

Mêrikê ajo tê gihîşt ku ez bi wê gotina wî êşiyame. Mêrik kenîya û got: "Na na-axa, xwe hêrs neke, pajawsta (bibore). Ez tişteki wiha nabêjim. Qesta min, hawê ku we fam kir, ew nîn e. Ez dizanim we dest neavêtiye namûsa kesî. We talanên kesî jî nebîrine. Mesele berevajiyê gotinê we ye. Xelkê hatiye di nava mal û milkên wê de û di nava mala wê de dest avêtiye namûsa we û xelkê welatê we talan kiriyê û dikin; gundên we dişewitînin. Ez vê dizanim. Ji bo van ez dibêjim hûn nebaş in. Ez dibêjim biyanan welatê we talan û paymal kirine, hemû hebûnên we li we qedexê kirine, bi namûsa we listine û difîzin. Lê hîna jî hûn di hev de ne û hûn berberî û neyartiya hev dikin. Hûn neyarê xwe nabînin û hûn hev dikujin. Ji bo birakujîya we, ji bo bîyekîtiya we, ez ji we re dibêjim hûn nebaş in. Pajawsta."

Wekî feqiyê ku dersa xwe jiber neke û nikaribe bersiva seydayê xwe bide. Min fedî kir û ez ji xwe qehirîm. Serxweşekî qazax ji min re dibêje, "Ji bo ku hûn nabin yek, ji bo ku hûn hev dukujin, hûn pis in."

De werê nemire û ji kerba dil neçe lo. Min ji xwe re got: "Amentûbillah.."

Nato li pey çî ye?

Peymana ku heftiya borî di navbera Nato û Rusyayê de li Parisê hate girêdan, deriyê Rojhilatê Ewropayê, ji rêxistina îttîfaqê re vedike.

Piştî şerê sar, di demekê de ku pakta Warşovayê hilweşiya, NATO hîn jî li ser piyan e.

Ew ne tenê li ser piyan e, her wiha berfireh dibe û hakimiyeta xwe xurt dike.

Rêxistina Bakûrê Atlantîk, NATO, di sala 1949'an de bi îdiaya 'rêxistina hevkarîya welatên demokratîk' hate damezirandin.

Wekî dijrin jî: Bloqa Sovyetê hate nimandin.

Lê belê hedefa yekemîn ya NATO yê tevgera şosyalîst a li seranserî cîhanê bû.

Bi vê armancê, wê di gava xwe ya yekemîn de rêxistina terorê ya kontrgerilla 'Gladio' saz kir.

Rêxistina ku navenda wê li biryargê NATO'yê ya li Brukselê bû, piştî cenga cîhanê ya duyemîn, di serî de faşîstên îtalî û alman, hemû hêzên paşverû yê li Ewropayê, li dijî tevgera komunist xistin nava têkoşinê.

Çalakiya wê ya yekemîn

Li Îtalyayê, di hilbijartinên demokratîk ên yekemîn de li dijî Partiya Komunist li dar ket.

Partiya Komunist ku bi ihtîmaleke mezin dikaribû were serkar, bi çalakiyên kontrgerilla hate astengkirin.

Di sala 1950'î de jî li Bruksela ku navenda NATO'yê lê bû, serokê nav-

dar yê Komunist ê Belçikayê hate kuştin û gelek çalakiyên din yê Gladio li dû hev hatin.

Lê belê metodên Gladio bi rengekî herî hov, bi bikaranîna MHP'ê li Kurdistan û Tirkiyeyê hatin pêkanîn.

Di nav armancên damezirandina NATO'yê de, aştî jî hebû. NATO'ya ku bi armanca parastina aştîyê hatibû saz kirin, bi rastî jî Ewropa ji şerê germ dûr girt.

Lê belê welatên ku rêberên NATO'yê bûn, şerên xwe şandin welatên cîhanê

sê -



ye - mî n

Fransa û Amerîkayî, li Vietnamê bûn sedema mirina 4 milyon însanî.

Li Cezayîrê: Fransayê hetanî ku Cezayîr winda kir, milyonek ereb kuştin.

Li Amerîkaya Latînî jî, ku tevgera şosyalîst li Angola û Mozambîkê hatin ser hukum, bi rêxistinên li dijî şoreşê dehan sal şer dane kirin.

Welatê serkêş yê NATO'yê, bombe-ya atomî ku kişf kiribû, li Hiroşîma û Nagazakiyê bikar anîbû û çavê hemû cîhanê tirsandibû.

Bi damezirandina NATO'yê re, pêş-

birkeyeke mezin ya bi-çekbûna nukleerî dest pê kiribû.

Bi vî awayî, pêşeroja cîhanê bû dilê bi hezaran fuzeyên nukleerî ku hatin çêkirin.

Ber bi dawîya salên 1980'yî, bi hilweşîna welatên Reel Sosyâlîst û sistema Sovyetê, mîzîna cîhanê serûbin bû.

Êdî pêvajoyeke nû dest pê kiribû

NATO'yê di sala 1991'ê de konseptê xwe guherand û rêxistina xwe ya leşkerî çalaktir kir. Wê, di bin maskeya 'Hêza aştîyê' de, Neteweyên Yekbûyî bi kar anîn li seranserê cîhanê, bû xwe-diyê karaktereke mudaxelekar.

Êdî bloqa Sovyetê tune bû. NATO jî neçar bû ku berdewamiya hebûna xwe, meşrû bide nîşandan.

Di encamê de NATO rêxistina îttîfaqeke leşkerî bû û îttîfaq jî li hemberî dijminên hevbeş tene çêkirin.

Gelo dijminê nû kî bûn?

NATO, ji beravajî-vê dest pê kir û metoda klasîk ya hunera şer pêk anî: Yanê, di şûna ku yekser dijminên xwe yê nû îlan bike, pêşiyê welatên ku wê wan wekî dijmin negirta hemberî xwe da xuyakirin.

Di vê çarçoveyê de, di sala 1994'an de, wê 'programa ji bo aştîyê hevkarî' kire rojevê û piraniya wan welatên Roj-



hilatê Ewropayê û Komarên Sovyetîk ên berê, bi 25 welatî re peyman îmze kir.

Programa Hevkarîya piştî hilweşîna Bloqa Sovyetê; di demekê de ku hemû mîzînen cîhanê serûbin bûbûn; bê ku fersenda mijûlbûnê bidin, bi gelek welatî dabûne pejirandin.

Her wiha balkêş e ku, li gelek welatên ku ev peyman îmze kirin, wê demê siyasetvanên populîst, ên heyranî rojava hebûn.

Armanca bingehîn a 'Programa ji bo aştîyê hevkarî' ew bû ku di demê kin de gelek welatan bê-teref bikin û wan bikin berendamê NATO'yê.

Wekî dihat hêvîkirin, NATO'yê di sala 1995'an de, ji hemû welatên Pakta Warşovayê re, endamî pêşniyaz kir.

Rusyayê li ber xwe da, lê belê hêza ku li dijî derkeve di xwe de nedît.

Di encamê de mirov dikare bibêje NATO li ser piyan e û rêxistina îttîfaqê fireh dibe; lê belê li dijî kê?

ZANA SERIN

Ji bo temaşevanên MED-TV'yê Anket

Cihê ku hûn lê rûdinin

Karê we

- Karker
- Karmend
- Esnaf
- Xwendekar
- Cotkar
- Serbest

Zimanê we yê zikmakî

Hûn kîjan zaravayên kurdî dizanin?

MED-TV çî tîne bîra we?

Hûn ji kengê ve li MED-TV temaşê dikin?

- 2 sal
- salek
- 2-3 meh

Wekî tê zanîn televîzyona kurdî, MED-TV'yê 2 saliya xwe qedand û kete sê saliya xwe. Di gel hemû astengiyên dagirkeran, ev televîzyona ku wekî "Televîzyona gelê bêdewlet" tê binavkirin, weşana xwe didomîne. Em dixwazin bi vê anketê bizanîn ku gelê me, bi çî çavî li televîzyonê dinêre û weşanên wê çawa dinirxîne. Em ji hemû xwendevanên xwe dixwazin ku vê anketê dagirin û ji me re bişînin. Emê piştî ku encam gihîştin destê me, bersivên we binirxînin û di rojnameyê de biweşînin.

Hûn li ku li MED-TV'yê temaşê dikin?

- Li mal
- Li cihekî din

Hûn her roj li MED-TV temaşê dikin?

- Erê
- Na

Li mala we cend kes li televîzyona kurdî temaşê dikin?

Li derdora we di cend malan de MED-TV heye?

Navê 6 bernameyan li gori rêza jê hezkirina xwe binivîsin.

- 1).....
- 2).....
- 3).....
- 4).....
- 5).....
- 6).....

Hûn zimanê kîjan bernameyan hêsan û baş dibînin?

Hûn zimanê nûçeyan cawa dibînin?

- Hêsan e
- Giran e
- Jê fêr nakim

Baş e

Bi dîtina we bernameyan li ser kîjan mijaran pêwîst in?

Ji ber MED-TV'yê we tu tade dîtîye?

Rola MED-TV'yê di pêkanîna yekîtiya neteweyî û çareserîya pirsgerêka kurdî de çî ye?

Li gori we pirsgerêka kurdî cawa çareser dibe?

Hûn ji bilî MED-TV li kîjan kanalên temaşê dikin?

Hûn kîjan wesanan dixwînin?



- 8.06.632: Hz. Muhammed wefat kir.
- 8.06.1992: Teatra Jiyana Nû' ya NÇM'ya Stenbolê hate damezrandin.
- 9.06.680: Hz. Huseyin li Kerbelayê hate kuştin.
- 10.06.1923: Nivîskarê frensî Pierre Lotî çû ser dilovaniya xwe.
- 10.06.1940: Mussolîni li ber Hîtler kete nav şerê cihanê yê duyemîn
- 12.06.1930: Fransayê Cezayîr dagir kir
- 11.06.1930: Leşkerên tirk û Îranê, bi hev re êriş birin ser hêzên kurd ên ku herêmên Agirî û Wanê bidest xistibûn.

- 14.06.1982: Deh şervanên PKK'ê li Lubnana Başûr, bi êrişê Israîlê jiyana xwe winda kirin.
- 14.06.1993: Li Amedê bayiyê rojnameyan Haşim Yaşa ji ber ku Özgür Gündem difiroto ji hêla kontrayan ve hate kuştin. Hêzên kontrayî nedixwestin ku gel rojnameya Özgür Gündemê bixwîne û hînî rastiyan bibe, lewre ne tenê bayî, kesên ku rojname belav dikirin jî bûn hedefa êrişên wan.
- 14.06.1923: Ernesto Che Guauara hate dinê.
- 14.06.1964: Serokê Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê (ANC) Nelson Mandela, bi cezayê hepiskirna heta hetayê hate mehkûmkirin.

AWIR

Şahiya Înstîtuya



Roja 31'ê gulana 1997'an li HA-DEP'a Bağçilara Stenbolê ji bo piştgiyariya Înstîtuya Kurdî şahiyek hate lidarxistin. Şahiye bi rêzgirtina hurmetê ji bo şehîdên Kurdistanê dest pê kir. Nêzîkî 1000 kes beşdarî wê şahiyê bû. Axaftina vekirina şahiyê Serokê Înstîtuyê Şefik Beyaz kir. Ew bi giranî li ser dagirkirina Başûr rawestiya û da zanîn ku artêşa tirk di wê hewla xwe de jî wê bi ser nekeve û di dawiyê de wê serkeftin para gelê kurd be.

Piştî axaftina Şefik Beyaz ji NÇM'ya Stenbolê Hozan Xanemir, çend stranên gelêrî û şoreşgerî pêşkêşî guhdaran kir û gelek çepik standin.

Piştî helbesta 'Divê bitirsîn' ku Ulfiye Özcan xwend, ji bo axaftinê Serokê Rûmetê yê Înstîtuya Kurdî, Feqî Huseyn Sağnîç derket ser sehnê. Feqî Huseyn derbarê çanda gelan û rewşa dagirkeran de wiha axivî: "Dema ku bixwazî gelekî bindest bikin, pêşî dest diavêjin zimanê wan, piştê jî êriş dibin ser çanda wan. Çand û ziman gelan derdixin holê. Heta salên 1980'yî dagirkeran ev yek tetbîq kirine û em jî teslîm bûbûn. Piştî salên 1980'yî xortên kurd rabûn, rêxistinên xwe ava kirin, sazîyên çandan saz kirin." Feqî Huseyn pêwîstiya xebatên akademîk û îlmî, di wî warî de jî girîngiya NÇM, Înstîtuya Kurdî û sazîyên bi wî rengî anî ziman.

Piştê jî bi rêzê ji NÇM'ya Edeneyê 'Koma Rewşen', dengbêj Salihê Qubîne, ji KAYY-DER'ê Koma 'Dengê Biratî' û di dawiyê de Koma Agirê Jiyân derketin ser sehnê û inêvan heta dawîya şahiyê coşandin.

Di şahiyê de mesajên rêxistinên navçeyên HADEP'ê yên Stenbolê, Kovara Özgür Halk, Demokrasi, Azadiya Welat, Komeleya Karkerên Înşaat, HA-DEP'a Mêrdînê, NÇM'ê û gelek der û doran tevî çepikan hate xwendin.

Di nav mêvanan de şexsiyetên wekî Serokê TOHAV'ê Av. Selim Okçuoğlu, Cîgirê Serokê Giştî yê IHD'ê û Serokê Şaxa Amedê Mahmut Şakar, ji IHD ya Stenbolê Veli Haydar Güleç, Seroka Komeleya Jinên Azad Mürüvvet Yılmaz, Müzeyyen Ayyıldız, Wênevanê başûrî Mihemmed Salayî, ji Demokrasiyê Hakkî Fırat, xwediyê Rojnameya Azadiya Welat û Demokrasiyê Celalettin Yöyler û Serokê HADEP a Stenbolê Hikmet Fidan bal dikişandin ser xwe.

Her wiha di şahiyê de ji bo hîn pêdiviyên Înstîtuyê mezatek hate lidarxistin. Piştî mezatê du xelat hatin dayîn, Xelata yekemîn ji hêla wênesaz Mihemmed Salayî ve dane mêvanekê ku cara dawî pere dabû. Ev xelat ji wêneyekî Musa Anter ku M. Salayî çêkiribû û ji çend berhemên NÇM'ê û Înstîtuya Kurdî pêk dihat. Xelata duyemîn jî, li ser navê dayikên şehîdan, dayika 'Dayê' ji destê Cîgirê Serokê Înstîtuya Kurdî Hasan Kaya stand.

Li aliyê din 16 kesên ku kursa zimanê kurdî ya ku ji hêla Înstîtuya Kurdî ve hatibû saz kirin, xelaskirin, belgeya serkeftibûnê girtin. Vê kursê di berfanbara sala 1996'an de dest pê kiribû û heta gulana 1997'an dom kiribû. Kurs jî hêla Cîgirê Serokê Înstîtuya Kurdî Hasan Kaya ve hatibû dayîn.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

ÇAVDÊRÎ

ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ



Çete

Çete, tê çend maneyan?.. Çete: Gerîla û şerê gerîla.. Teşkilata xirabî û anîzaziye? Tiştên ku bi sirî tînin kirin.. Di nava gel-de, ji sipiya re jî, dibêjin çete... Wekî kêç û spiyan çete mirovên maldar û ên dewleta jî çeteyên wan hene. Çend mîsal û mînak

Çeteya Susurlukê (!) – Dewleta Romê dê û bavê wan çeteyan e.

Çeteya Bucak... Çete ketin canê me. Artêşa Ubeydullah Nehrî ji berdestê çeteyan helak bû. Li cihina jî, ji spiya re dibêjin tank. Lewra wekî tanka dimeşin. Wekî kêçan, wekî kûliyan xwe nakewizînin. Xwîna însanan dixwin, bêcan, bêmecal dihêlin.

Çeteya ku ez behsa wê dikim, berê çeteya Seddam bû. Mirovekî kurd bû. Welatparêzî tu carî nehatibû mala wî. Kurdekî kemirî bû. Mirov digo belkî erebe e. Lê bi esl û fîsil kurd bû. Sala 1991'ê, em mehvane wî bûn. Hevalekî ez danîm mala wî. Go: "Hûnê heta muheletekê li vira bin. Ew çeteya hanê welatparêz e. Wê hemû pêdiviyên we, ewê pêk bîne.", wiha got û çû. Ez û hevalê xwe nêzîka pazde rojan li mala wî, berê çete, piştê welatparêz man. Lê wekî bédil ew welatparêzî qebûl kiribû. Ne diaxivî, ne dikenî. Ne digot merheba, ne jî jahrheba, rabin herin!.. Qenc û xirab tu tişt nedigot. Xwe digevizand, tûtina xwe ya qaçax dipêça, çaya xwe vedixwar. Tizbiya xwe çep û rast dihejand. Piştî çend rojan min ew da axaftin. Min tûjik lê dixistin bi pirsan, ew jî diaxivî:

– Demek tu berê çeteyê Seddam bûy hee?..

– Belê!.. Xwezka min bi wan rojan.

– Çima, qey Seddam çetir bû? Kuliye bi te re kurdîti nemaye. Serokê kurdan dibêjin: "Em demokrasiyeke esil li Başûr ava dikin." Zaxo berê baş bû, lê a niha?

– Tu çi dibêji camêr? Xuya ye ku tu ne ji vir î? Berê malê min, erdê min, meaş û qurdreta min hebû. Em di rewşeke gelekî xweş de bûn. Seddam mala xwe jî, mala me jî xera kir. Kete herbê. Qels ket. Meçûr ma, ji Kurdistanê derket. Ehmaqên wekî min jî, çend gule berdana wan. Me xeber şand ji yê çiya re. Ji Mesûd re, ji Talabanî re, ji pêşmergeyên wan ên egîr(!) re, xwe ji çiyê berdane deştê. Rabûn gotin me 'şoreş' çêkir. Her tiştê me ji dest me girtin. Çawa çêbû ev şoreş? Kê çêkir? Me tiştêk fêhm nekîr. Tiştê ku me fêhm kir ew bû; ê ku hat li serê me xist. Tu tişt di destê me da nehiştin.

– Ev hevalên ku çûn, em teslîmî te kirin çi kes bûn.

– Ev karker in!.. hûn jî karker in. Û hûn jî hepsî ne. Hevalê wan in!..

– Tu çawa zanî wan?

– Ez zanim. Gelek hepsî hatin mala min. Ez karkeran hemiyan nas dikim.

– Karker jî dixwaze şoreşê çêke. Tu wan çawa dibînî?

– Heta îro min tu zirar ji karker nedîtiye. Karker rast e, durîst e. Û dixwaze li Tirkiyeyê şoreşê çêke. Ew doza şoreşê wekhevî dîke. Baş e. Baş e. Bifa bike. Emê bibînin.

Sûcê wan kurdbûna wan bû



Nişan Karay pîreka Hacı Karay

Hûn dikarin hinekê behsa jiyana Savaş Buldan bikin?

● **Pervin Buldan:** Belê. Savaş, çi tiştên antî-demokratîk ku li Tirkîyeyê tên kirin, li hember disekin. Savaş, însanekî li dijî zordestiyê bû. Her wiha jî ew li dijî wê politikaya dewletê bû ku li ser îmhakirina kurdan saz bûbû.

Bi vî awayî jî ber fikir û ramanên xwe hem wekî şexs, hem jî bi malbatî leqayî zordestî û îşkenceyê hat. Di zîndanên Amedê û Culemergê de raza.

Bandora birayê Savaş, Necdet Buldan

Tiliya Mehmet Açar di 3 hezar kuştinên faîlî meçhûl de heye. Wekî din li ser gotina wî ez wiha bibêjim, ew serê wî yê ku bêhn pê ketiye û jî xwinê pêştir tiştêkî nabîne, pênc qurûş pere nake, em van îdiayan red dikin.

li ser wî gelek bû ku Necdet Buldan di sala 1989'an de di hîlbijartinê de bû serokê belediyeya Geverê, ku li dijî pêkhatinên antî-demokratîk bû, di sala 1993'yan de derbasî DEP'ê bû û navê kurdî li xwarin-geha xwe kir, li hemberî cerdevaniyê sekinî. Li navçeyê, li hemberî ew qas zordestiyên dewletê sekinî, dewlemendbûna wî, ya herî girîng jî kurdbûna wî, ew dikir mirovekî bi talûke di nav rayedarên dewletê de.

Lewre jî roja 3'ê pûşpera 1994'an, li Stenbolê li ber Hotela Çınarê jî alî heşt kesan ve ku nasnameya polîsan bi wan re hebû; Savaş, Adnan û Hacı hatin revandin.

Savaş Buldan beriya ku bê kuştin tu carî qala kuştina xwe dikir?

● Na hiç qala kuştina xwe nedikir. Lê dizaniyê ku wê bê kuştin. Mehmet Açar çinarê me bû, lê me bi vî nedizaniyê. Polîsên ku li ber deriyê Mehmet Açar nobet digirtin, me digot qey hin kesên girîng li vî derê rûdînin, paşê em pê hesiyar ku Mehmet Açar li vî derê rûdîne. Bi vî mebestê Savaş jî xwe di emniyetê de dihesi-

band, lê rûniştina Mehmet Açar xetereyek bû.

Di ser kuştina Savaş Buldan û hevalê wî re 3 sal derbas bûn. Li ser kuştina her sê karsazên kurd heta niha derheqê failan de encamek derneket. Li ser vî yekê hunê çi bibêjin?

● Belê di ser bûyerê re 3 sal derbas bûn, lê di van her sê salan de dewletê jî bo dîtina failên Savaş, Hacı û Adnan tu tişt nekir. Îfadeyên me nehatin standin, her wiha jî bo bûyerê wînda bike, çi jî destê dewletê hat kir. Me behsa otelê kir ku ka-

meraya vî otelê heta 500 metroyî dûrî xwe dibîne, bi awayekî taybet hatiye amadekirin, berî bûyerê me bi deh rojan çenteyekî jinikekê wînda dibe, ew bi saya kamerayê tê dîtin, me jî eynî rojê xwest ku em herin li kamerayê binihêrin, lê ew daxwaza me nehat pejirandin. Me jî wê rojê li her derê got ku kuştin bi destê dewletê pêk hatiye, kes li me nehesiya, hemû hewl û catên me bê encam man. Hemû derî li ber me hatin asêkirin. Her wiha piştî qezeya Susurlukê derket holê ku Abdullah Çatlı dişibe resmî robot ê kesekî ku di kuştina Savaş, Adnan û Hacı de cih girtine. Ew wêne jî hêla cendirmeyan ve hatibû çêkirin.

Ji aliyê din ve, ji her sê fîmên ku jî ber kuştina Ömer Lütfü Topal tên dazandînin, yek jî wan bi navê Ayhan Çarkın bi devê xwe gotibû "min Savaş Buldan kuştîye." Dîsa İbrahim Şahin di îfadeya ku dabû Komîsyona Susurlukê ya meclîsê dabû xuyakirin ku kuştina Savaş Buldan û Behçet Cantürk jî bo dewletê baş bûye.

Berî niha bi çend rojan Mehmet Açar daxuyaniyek da û got: "Malbatên Savaş

Buldan, Behçet Cantürk, Hacı Karay, Adnan Yıldırım, di navbera xwe de ji bo kuştina min trilyonek pere berhev kirine." Ji vî yekê re hunê çi bibêjin?

● Belê, Mehmet Açar bi vî daxuyaniya xwe dîsa dide nîşan ku ew tevî bûyera kuştina Savaş, Adnan, Behçet û Hacı Karay bûye.

Jixwe gava di sala 1992'yan de girtin ser malêda ku Leyla Zana jî li malê bû, li ser vî yekê, çapemeniya aligirê dewletê, 15 rojan bi tenê nûçeyên wekî 'mafya içinde hesaplaşma (hesabdîtina di nava mafya de)', 'hücre evine baskın (cerda li mala hucreyî)', 'pis ittifak (hevkarîya kirêt)', 'Zana, Buldan bir arada (Zana û Buldan bi hev re)', 'PKK'ye ait hücre evinde çok sayıda silah para ele geçirildi (di cerda bi ser mala hucreya PKK'ê de gelek pere û çek bi dest ketin)', 'Savaş Buldan kaçarken yaralandı (Savaş Buldan dema xwest bireve, birîndar bû)' û hwd. weşand. Lê li malê jî demançeya wî ya bi ruhsat û hinek pereyan pêştir tu tişt nehatibû girtin.

Piştî kuştina Savaş di jiyana we de çi guherîn çêbûn, di wateya siyasî de?

● Piştî ku Savaş hat kuştin, ez bêhtir bi têkoşinê ve hatim girêdan. Ji ber ku vî heftiyê Savaş Buldan, Hacı Karay, Adnan Yıldırım sala wan a sisiyan e ku derbasî nava karwanê Şehîdan bûne. Dilê me pir xemgîn e, lê divê bê qebûlîkirin ku dijwariya şer, têkoşina germ vî fine ber me.

Divê mirov di riya rizgariyê de bedela şoresê bide. Ew jî qaideyê şer e, tiştê girîng li vî ew e ku mirov bi şehîdê xwe ve girêdayî bimîne. Di şer de, hin qaideyên ku mirov xwe nikare jî wan bide alî hene.

We derbarê kuştina Savaş Buldan de û ji bo ronîkirina bûyerê çi xebat kirin. Heta niha tiştêkî berbiçav nîne, hunê vî ye-

kê çawa dinirxînin?

● **Nihat Buldan:** Beriya her tiştî jiyana li welatêkî wekî Tirkîyeyê xerîb e, lê em di vî de birewerin.

Di têkoşina rizgariya neteweyan de gelek bedel hatine dayîn.

Belê ez dixwazim behsa sala 1992'yan bikim. Di 92'yan de gava girtin ser mala Savaş Buldan, armanc înfaz bû. Lê ji ber ku mebusa DEP'ê Leyla Zana û Mehdi Zana li malê bûn, înfaza Savaş du sal paş ve xistin. Her wiha em jî bo van tiştan amade bûn.

Li herêmê, em malbateke bi bandor bûn, endamê eşirê bûn û me cerdevanî jî qebûl nedikir, li aliyê din, me piştî girtinê da têkoşina rizgariya azadiyê, lewre jî politikaya dewletê jî bo me diyar bû.

Nitekim di 1993'yan de li Otele Holiday in, Tansu Çillerê daxuyaniyek da û got: "Di destê me de listeya karsazên kurd ku piştî girtinê PKK'ê dikin heye, emê jî wan hesab bipirsîn." Piştî vî daxuyaniyê bi sê mehan, karsazên kurd Behçet Cantürk, Fevzi Aslan û birayê wî Hacı Karay, Savaş Buldan, Adnan Yıldırım hatin kuştin.



Li gorî îmkânên xwe min jî hin lêkolîn kirin. Me hingê jî gotibû, em vî jî dibêjin; bi tesadufî, kamyonêk li Tirkîyeyê qelibî û tiştên ku berî wê bi 3 salan me digotin, a niha di DGM'yan de bi awayekî vekirî tene holê.

Mehmet Açar îdia kir ku karsazên kurd trilyonek pere di nav xwe de berhev kirine ji bo kuştina wî, hunê daxuyaniyên bi vî rengî çawa dinirxînin?

● Me berê jî got, di bin hin navan de hin tiştên gotin, (wekî hesapdîtina di nava mafyayê de, kuştina bi şeweya îtalî), ev tişt berê hedefan diguherin. Piştî wê jî tiliya Mehmet Açar di 3 hezar kuştinên faîlî meçhûl de heye.



Pervin Buldan, Hasibe Maruş, Evî herdu keçikên xwe, Zelaî û Hehîr



Wekî din li ser gotina wî ez wiha bibêjim: Ew serê wî yê ku bêhn pê ketiye û ji xwînê pêştir tişteki nabîne, pênc qurûş pere-nake, em van îdiayan red dikin.

Ez mîna keke din bidim: Li odeya me-bûsê MHP'ê pere û eroîn hate girtin. Çi ma ew nayê kuştin. Ev li dijî kurdan û karsazên wan polîtîkayeke taybet e. Her wiha bi şexsan re ti eleqeya me nîn e, bi sistemê re eleqeya me heye. Bi tenê di nav vê sistemê de eleqeya me, bi Çiller, Ağar re heye. Mejiyê çeteyan ev her du kes in. Belê em bibêjin wan hin karên nelirê kirin hatin kuştin, ma qey Apê Musa jî ev kar kir, Av. Medet Serhat, Yusuf Ekinci, yê ku li Enqerayê hate kuştin Namîk Erdoğan, dîsa li Geverê Midurê Nifûsê Necip Baskin jî ev kar kiribû? Ew îdia giş ji bo xapandina raya giştî ne.

Hûn dikarin bi kurtayî behsa jiyana Adnan Yıldırım bikin?

Atilla Yıldırım
(Bîrayê Adnan Yıldırım)

● Wekî hûn dizanin, li Amedê hate dinê. Adnan bi tiştê ku qezenc dikir, alîkariya gelê xwe dikir. Ji ber vê destvekiribûna wî jî di nav gel de dihate naskirin û hezkirin. Wekî din alîkariya pêşmergeyan kir, nêzikî DEP'ê bû, her tim beşdarî şevên DEP'ê dibû. Bi kesên welatparêz re diçû û dihat. Ji ber vê yekê kete listeya înfazê.

Der barê kuştinên failî-meçhûl de gelek tişt hatin gotin. Hûn jî malbateke di wî warî de mexdûr in, hûn nedîtina failan û bêdengiya dewletê ya di wî warî de çawa dinirixînin?

● Fail û yê ku li failê digerin yek in. Yanî li Tirkîyeyê failên van înfazan polis û çeteyên vê dewletê ne, kesên ku li wan digerin dîsa polis in, bi wî awayî nayên dîtin; ê ku li xwe bigere nikare bibîne. Ê ku li eyneyê binêre wê bi awayekî zelal xwe bibîne.

Ez dikarin vê bibêjim, bi windakirin û înfazan ev mesele çareser nabe. Îtirafkarê dewletê di kanaleke televizyonê de got, "êdî bi kuştina insanên ku ez nas nakim, aciz bûm." Belê hetanî ew ji kuştinê aciz nebin, em jî ji mirinê aciz nabin.

Vê hefteyê salvegera kuştina Adnan e, li ser kuştinê hûn, wekî pîreka wî dikarin çî bibêjin?

Hesibe Yıldırım
(Pîreka Adnan Yıldırım)

● Bi rastî kîna di dilê me de nayê gotin. Hem li ser me, hem jî li ser sebiyê me bandora xwe nîşan dide. Em vê dizanin ku di sala 1994'an de ji aliyê dewletê ve hate revandin û kuştin. Jixwe ê ku ew birine polis in. Daxwaza min ew e ku wan failan îdam bikin.

Adnan Yıldırım tu carî qala kuştina xwe dikir an na?

● Qala kuştina xwe nedikir, lê carekê ew çûne buroya Savaş Buldan, Behcet jî li wê derê bûye. Behcet ji Adnan û Savaş re gotibû telefoneke wiha hat, wê me bikujin. Piştî ku Behcet hate kuştin, min jî ji Adnan re got wê te jî bikujin, lê Adnan jî

e. Wiha wê hetanî ku here!

Hûnê li ser kuştina kurê xwe çî bibêjin, gazinê we çî ne?

Güllü Karay (Dayika Hacı Karay)

● Ma ezê çî bibêjim, me zanibû bê sûcê mehkemê hebû. Ceza hebû, qanûn hebû, bila daba mehkemê bila heps kiriba; saet li pêncê sibê, ji Otele Çinarê birin, birin nav ormanan, sê şevan di îşkenceyê de maye, piştî îşkenceyê sileh li serê wî dane. Sûcê wî çî bû, wan çî sûc kiribû; dewlet şelandibû, talan kiribû, çî kiribû? Em kurd, zimanê me kurdî ye, em bi kurdî di axivin çî bikin. Ha ez vê dibêjim kurê min. Em li ser heqê xwe di axivin ku Xwe-

Niha di ser kuştina kurê we re 3 sal derbas bûn, di dilê we de çî derbas dibe?

● Ji kurê xwe re bêjim, heta ji Geverê hatim vê derê ku ez hîn bibim ka ew li ku ye, gotin li xestexaneyê ye; min xwe avê-te bextê wan, kesî şanî min neda, Polisên hawir dora me bi sileh bûn, fermara kurê min û ê wekî wî dabûn hikûmetê. Ez hêvî dikim tu carî kuştinên wisa ne ji bo me tenê, ji hemû dinê nebin.

Nişan Karay
(Pîreka Hacı Karay)

● Hîn qeweta me hebe, emê mucadela xwe bikin. Em li ser xwînê biaxivin. Her sê bi zilmê çûn, ne her sê tenê, hemû şehîdên Kurdistanê bi zilmê çûn. Zilma ku li wan hatiye kirin li Hesên Huseyin jî nehatiye kirin. Ez heya saet çaran jî bi Hacı re axivim. Min go ji bo (çi) nayê, go hetanî niv saetê, tê malê, saeta wan çû nehat, min telefon kir, telefona wan cevab neda, me got meselek heye. Em şevqê çûn ba polisên sivil, Neçdet Menzîr bi xwe gel me xeber da, got tu 'xema nekin, di destê me da ne.' Piştî sê rojan Neçdet Menzîr bi xwe ji me re telefon kir, got 'me saet dîtine, yabancî saet', me li saetê nêrî, me nas kir. Zilm lêkirin, îşkence lêkirin. Berî niha bi hefteyekê yekî digot, 'di îşkenceyê de kirine hewar'; hewara wan hetanî guhê me dihat. Heke dewlet hebe divê zilmê bike?

Ev sê sal derbas bûn dewletê tiştê negot. Jixwe dewletê bi xwe kiriye. Sûcê wan, xetayê wan kurdbûna wan bû, li ser miletê xwe di axivim. Sûcê her sê birayan jî eynî bû. Daxwaza me ev e ku navê her sê birayan bi hev re bîn nivîsandin.

Leyla Karay (keça Hacı Karay)

● Belê niha em vê dixwazin ku failê wan, xwe derkevin holê. Kuştina bavê min tenê na hemû failî-meçhûl divê bîn ronîkirin. Ji aliyê din ve kuştina karsazên kurd ne tesadûfêk e, hemû karsaz ji ber ku bi fikir û ramanekê bawer in, ji aliyê dewletê ve tên kuştin. Em bêhtir bi têkoşinê ve tên girêdan. Failên wan cinayetên jixwe kişî in, em bi kuştinê xelas nabin. Hetanî dawiyê emê ji çihê ku wan berdaye xebatê bidomînin.

Kurê Hacı Karay Emrah

● Bavê me her sê yan li ber çavên dujmin histirî bûn. Bavên me kuştin ji ber ku ew li mafê me digeriyan.

HEVPEYVÎN: AZAD ALTUN


Fail û yê ku li failê digerin yek in. Li Tirkîyeyê yanî failên van înfazan polis û çeteyên vê dewletê ne, kesên ku li wan digerin dîsa polis in, bi wî awayî nayên dîtin; ê ku li xwe bigere nikare bibîne. Ê ku li eyneyê binêre wê bi awayekî zelal xwe bibîne.

wiha bersiv da; "ma qey em jî ne mîna Behcet in."

Dawî tişteki ku hun dixwazin bibêjin heye?

● Belê ez naxwazim ji vir û pê de kuştin çêbibin. Em hemû yek in. Bila xwîn bes bê rijandin. Tişteki bi qasî aştîyê xweş nîn e. Ev zilma tirkan li ser me bes

dê teala heqê me bistîne. Heqekî me heye, miheqeq emê bistînin. Bi xwedayê mezin ku li kurda bixe ku son'bixe, li tirka jî wê son biçê. Xwedê teala emrê me kurda dirêj bike. Hemû zariyê min in, hemû tev kurê min in. Ya Hacı mir ya nemir ji bo kurê min qet tu ferq nîn e, êdî ma çî bibêjim?



Emrah Karay kurê Hacı Karay

Çend helbestên bijarte

Li hucra min

Bêbihar,
Bêcejn
Ev çend demsal şevên bi keder
Min ken ji bîr kir
Li hucra min
Di wa şevên bi keder de
xwîn tê
xwîn tê ji xewa min
Li hucra min

Navê Min

Ji rûyê zarokê kurd dişemite
Rondikê çavên germ in
Di çavan tirs de
hêvî me dibiriqim

Ne lorika dayika me
Strana dayika me
Bûme pizot di fedayîtiya xwe de
Canekî min heye dawîya her tiştî
Min diyarî serxwebûnê kir
Hêrs im, nayême ziman
Zilan im... Zilan im, Zilan

Ez pê dixim çiraya şeva
Qedexe dikim...
Qedexe dikim kedera
Girîng e ku ez herim

Bangî min dikin çiya
Bi zimanê şer dibêje...
Rewşen...Rewşen...Rewşen

Ji binê çiya
Diherikin kolanê înkare
Canê me di nav diranên me de ye
Lê...
Vê carê
Em hatin cana bistînin
Em tèn dîrokê binivîsînin

Kin lê kurt
Bi dengê evîne
Bi rengê xwîne
Em tèn dîrokê binivîsînin
Navê min Bermal
Navê min Kendal

HALİL ÖZER



Gula Dawî

Çima...
Te ev gul da destê min
bi stûxwarî
Tu bû qey
Ya ku dilê min kul bike
Qey wê bêyî min derbas be
jiyana bêînsaf
Tuyê bêyî min hez bikî
Ji kulilkên çolteran
Ka...
Te ji bo min pir hêstir barandibûn
Qey ziwabû kanika çavên te
Te girtiye qey
Deriyê hêrsa ku diherikî gola evîne
Qey te tenêti hilbijart
di şevên sar û tarî de
Bibêje, bibêje...
Bibêje û di dilê xwe de
nehêle tu tiştî.
Ji bo çi gula çilmisî
ne gula kesk û sor û zer
ne gula rengîn..

Ji bo çi ne bi du destan
bi destekî û bi melûlî
te dirêj kir gula dawîn..
Rast e..
destê min hînî çekê bûye
Lê min girtina gulên ji bîr nekiriye
Û min evîn jî ji bîr nekiriye
Min şervanî nequhartiye
bi evîne
Ez bi çekê diparêzim
guldestên nergîzan
Her du tev de, tu zanî
her du tevde...
Axx..
ne hezar berekên hov
lê guleke çilmisî
ez birîn kirim îro..
De, de..!
Fêma bike, destê xwe bide min
û min hembêz bike
bes e lêê...!

ÇIYA MÂZ

Pempilûk (perwane)

Rojekê ji rojên buharê
Ez digeriyam ji xwe re
Çavên min
Li pempilûkekê ket
Pempilûkeke spî difirîya
bi canê xwe yê sivik
Vê çiçekê wê çiçekê
Ez ketim bîra wê
Min di dilê xwe de got:
Xweziya em zo bana
Ji nişka ve
Pempilûk hat li eniya min nişt
Ez vecinîqim
Min got: Dilê me bi hev re yek e.
Hêdî hêdî min destên xwe
birin û anîn ser

Ji bo ku ez çavên xwe jê tîr bikim
Lê di navbera tiliyên min re firîya
Li ser gangilikê (xexecok) nişt
Bilez ez beziyam, min got:
Ez te û gangilikê bi hev re bigirim
Min destê xwe avêt gangilikê
Pempilûk vê carê çû ser "bûk me
zavê"
Îcar çûme, bi hêdî min destê
xwe avêtinê, dîsa pempilûk
Ji destê min firîya.
Lê destê min bi ardikê wê bû
Ez pir qeherim, pempilûk kenîya û got:
Xweda ez dame ji bo ku buharê
bixemilînim
yên wek te bi kês û şahî bijîn

XANIM

Dîrok

Ey dîrok ezê biqelişînim perê teyê
bi qirêj û gemar
Êdî min zincîra koletiyê qetandiyê
Ez natirsim ne ji kedxwaran
Ne jî ji malxoyên malan
Êdî ez li pêşiya gel dimeşim
Ez doh bermal bûm, îro jî li ber
welat im
Ez ne tenê pîrek im, ez dayik im
ez şervan im
Ez şoreşvan im, ez şer im ez însan im
Li ser lat û zinaran Berîtan im
Ez li Dersimê Zilan im,
li Sêwazê Bermal im.
Min bi canê xwe azadî afirandiyê
Ez ji jina kurdan re bûme ronahî
Êdî tarî li pey min qediya
Ez bûme bûka mediya

Ez wek teyrê ecelê li ser dêwekî
heftserida dimeşim
Heyf û tola hezar salan bi xwîna
xwe hiltînin
Ez bûme wekî pelotên agirê azadiyê
Min li bejna xwe ya delal û ciwan
Jiyaneke bêmîrin ava kiriyê
Ez bûme heşret û axîna dilê dayikan
Ez bûme qêrîn û zarîna zarokê
ber peştra
Ez bûme ala rengîn, min çiya
xemilandim
Dijmin ji reng û dengê min ditirse
Ez bûme nişana berxwedanê,
ez bûme dengê cîhan
Ez bûme bûka Kurdistanê
Wek hûn jî dibînin ez bûme heştê adar

YILDIZ ÖLME



Li navendên çandê, çalakiyên vê hefteyê

Li NÇM'ya Stenbolê

● 8.06.97 **Yekşem**: Ege Sanat Tiyatrosu 'Birêz Z ez mirov', saet:

14.30

Salvegera damezirandina Teatra Jiyana Nû, saet:18.00

● 13.06.97 **Fr**: Filmê '1 Gulan-2 film' Dehêner: Hüseyn Karabey, saet:18.00

● 14.06.97 **Şemf**: Filmê '1 Gulan-2 film', saet:13.00

Li NÇM ya İzmirê

● 8.06.97 **Yekşem**: Belgefîlmê Ismail Beşikçi, saet:15.00

Folklor: 'Listikên gel û mîzarîsen'; Koma Kendal, saet:18.00

● 13.06.97 **Fr**: Konsera Koma Gulên Xerzan (Roja xwendekaran), saet:18.00

● 14.06.97 **Şemf**: Belgefîlmê Ismail Beşikçi, saet:15.00

Konsera Koma Gulên Xerzan, saet:18.30

Li BEKSAV'ê

● 8.06.97 **Yekşem**: Filmê "Özgürlük Savaşçısı (Şervanê Azadiyê)"

Derhêner Pino Amenta, saet:18.00

● 11.06.97 **Çarşem**: "Çiroka rêwitiyêke bi bawerî" di salvegera yekemîn de rojîya mirinê de, saet:19.00

AWIR

Ciwanê HADEP'ê xeftiyayanê xo kenê vêşî



Bandorkerdana başûrê Kurdistan ser ciwanê HADEP'ê protestokerdana xo her roj kenê vêşî. 25'ê gulan de İzmir de, jû dê pûşper de Stenbol de, 3'ê eynî meng de jî Enqere de ciwanê HADEP'ê amey pêser, eşkerayîn virayşt û bandorkerdana Kurdistan Başûr nalet kerd.

25'ê mengda verîn de nezdiyê 1000 ciwanê HADEP'ê İzmir amey pêser eşkerayîn virayşt û wast ke artêşa tirk Başûra hema bivejiyo. Şanê jûwê meng de jî saet heşt û nîm de nezdiyê hezar ciwanê HADEP'ê Stenbolî kefen û meşalana Lîseyê Galatasaray verd amey pêser û eşkerayîn virayşt û bandorkerdana Başûr nalet kerd. Ciwananê Komîsyonê HADEP'ê Stenbolî eşkerayîna xo de vat ke, hetanî nika şeran de xeylê şarî mardî, xeylî ciwanî kişyay. Şeran bêgûnî, bêhesrandê çiman, bê-mardin teva nêda şarî. La belê no qaydewê ewro jî wina rameno. Fina ciwananê HADEP, da zanayîn ke hemû şerê xortana ramyenê, xortî ke esker meşrê şerî nêbenê û mardimî nêmirenê. Qandê coya mayê vam wa xortî eskera meşrê. Eşkerayîn dima ciwananê HADEP Lîseyê Galatasaray het ra hetanî Kûçeyê Mis sloganê "Ciwane şero lîmin nêwazenê", "Mehes bê, mehes bê, heş bê se gamo bêro şima.", "Bijî birayîna şaran", "Esker meşrê, gûniya birayandê xo meşrîne" eyştî û wija bî vilay.

3'ê meng de jî Enqere de nezdiyê 200 ciwanê HADEP kûçeyê Yükseli de amey pêser, bandorkerdana Kurdistan

Başûr protesto û nalet kerd. Ciwananê HADEP'ê Enqere eşkerayîna xo de wast ke, artêşa tirk Başûra hema bivejiyo. Eşkerayîn dima ciwananê HADEP "Bijî birayîna şaran", "Wa bimirê şerî, bijî aşî", "Mehes bê, mehes bê, heş bê se gamo bero şima." eyştî û bî vilay.

Kampanyaya cixare meşimê


Komîsyona Ciwananê HADEP kampanyaya "Cixare megrê, rojname bigrê" iyê 15'ê meng de danê destpêkerden. Qandê kampanya ciwananê HADEP afîş û vilawokî kerdê hedre û êdê nînan 15'ê meng de vila kire.

Wilowokeke xortanê HADEP kerdo hedre eyde jî nusto ke hema ca dê dinyay de 1 milyar û 360 hezar mardimê cixare şimenê û nînan ra her ser xeylê mardimê mirenê. Fina nusyawo ke dewleta qandê şerî perandê cixare ra baco taybet gena û goreyê amorandê 1992 perandê cixaran ra 7.1 trîlyon TL. girotê. No amor 1997 jî biyo 14.4 trîlyon. Qando coya xortê HADEP vanê: "Cixare meşimê, xo meqedinê. Rojnamen biwanê, xo zanawan kirê." Sloganê kampanya jî wina ye: "Cixare meşimê şerê liminî rê hetkarî mekrê. Cixare megrê, rojname bigrê. Cixare meşimê rojname biwanê. Qandê weşîna rindin û qandê welatê xo cixarey viradê. Welatê xo rê hetkarî bikrê."

MEMED DREWŞ

TÎŞK

AMED TÎGRÎS



Tolerans li hemberî rexnegirtinê pîvana demokrasiyê ye

Li welatê ku tolerans û bêhnfirehbûna li hemberî rexnegirtinê tune be, mirov nikare bibêje ku li wir demokrasi heye an jî bêhn û pejna demokrasiyê ji wir tê. Ev yek bi azadiya ramanî ve girêdayî ye. Li welatê ku azadiya rexnegirtinê tune be, mirov nikare dîtin û bîr û baweriyên xwe bîne zimên. Wê demê li wir bi tenê bîr û baweriyek heye an jî bîr û baweriyêke derbas dibe û yê din nikarin bîr û baweriyên xwe bînin zimên an jî li ser kaxizê binivîsin. Ev bîr û bawerî dikare bi alikariya komeke leşker an jî komeke sivil bibe, dikare li ser navê partî, rêxistinekê an jî li ser navên çend partî û rêxistinane bibe. Li ser çî navî dibe bila bibe, zêde ferg nake. Her çiqas navên kom, partî an jî rêxistin gelek in jî, dîsa di rastiyê de, bi tenê xwediyê bîr û baweriyêke li ser desthilatdaritîyê û gotina wê derbas dibe.

Ev tolerans û tehamûla ji rexnegirtinê re, ne bi tenê ji bo dewletan derbas dibe, her wiha ji bo partî rêxistin, dem û dezgeh û kesên jî derbas dibe. Ev pîvan û prensîbeke bingehîn û giştî ye. Di dema me de, li her cihê çihanê ji bo her rêxistin û kesî ev derbas dibe. Encama pratîka hezar salan daye nîşandan ku dema rexne tune be, pêşketin çênabe, dîr nêzik ew sistem dixitîme, civak radiweste û heger di dawiyê de çare neyên dîtin, civak an jî rêxistin her ku diçe teng dibe û dikare hilweşe jî. Me bi çavên serên xwe dîtin ku di van deh salên dawiyê de çî bi serê sistema sosyalîst a mezin û bêhempa (!) de hat. Ev encam û tecrûbe îro ji bo komara Tirkîyeyê jî derbas dibe. Ji heftê salî bêhtir e ku li Tirkîyeyê rê li rexneyan hatiye girtin. Dest û devên gel û ronakbîran hatiye qeyd û bend kirin. Ji bo îmhakirîna gelê kurd azadiya ramanî ji navê hatiye rakirin. Ev jî bêguman dîr-nêzik, dê dawîya komara Tirkîyeyê bi xwe re bîne.

Ez naxwazim vê pirsê bi awayekî teorîk û alozîkî pêşkêş bikim. Ez dixwazim bi awayekî vekirî û rojane vegerim ser vê pirsê han a ku me kurdan ji nêzik ve eleqedar dike. Belê di vî warî de em her dem rexneyan li tirkan digirin. Henek û qerên xwe bi wan dikin û dibêjin ku "ew çiqas paşketî ne û demokrasi di nav wan de tune.. Tolerans û tehamûla ramanî di nav wan de tune." Belê ev hem ji bo dema niha û hem jî ji bo demên pêş gelek-girîng e. Ji ber ku civata me li ser vê bingehê te avakirin û bi pêş ve diçe.

Îro em di warê tolerans û tehamûla rexnegirtinê de hîn ji tirkan jî gelek bi paşvetir mane. Ji rêxistinên mezin heta yê biçûk, ji yê şoreşger heta yê reformîst, tu rêxistineke kurd rexne qebûl nake. Di teoriyê de bike jî, lê dema tê pratîkê, qebûl nake. Rexne ji xwe re wek dijminayeti û dijmin (çêr) dibîne. Rast an şaş kîjan rêxistin an jî kes rexneyek li ya din bigire, êdî dijmintî dest pê dike. Di rexneyê de, li niyeta xerab digerin. Ev tişt ji bo ew kesên ronakbîr ku rêxistinane wekî diktator dibînin jî derbas dibe. Dema kesek rexneyekê li wî an jî li berhemên wî bigire, êdî dibe dijmin. Lo demokrato, ronakbîro ka demokratabûna te li ku ma? Tu gelek rêxistin, dem-dezgeh û kom bi antî demokratabûnê rexne dikî, çima tu ew qas demokratekî bihteng îro?

Belê, wekî her tiştî jî bo rexneyê jî hinek prensîb û sînor hene. Ya girîng divê mirov wan prensîb û sînoran derbas neke. Ev çî ne? Divê mirov sînorê rexne û dijmintiyê ji hev û du cuda bike. Ji çarçova prensîbên mirovahî, xû û exlaqî dernekeve der. Heqaret li rêxistin û kesên neke. Weha be ku rexne rola xwe ya negatîf nelîze û dijmin bi hêz neke. Divê rexne mirov nexe rêzên dijmin, lê bixe rêzên dost û hevalbendan.

Di vî amanc û çarçoveya prensîban de, divê em bikaribin, li rêxistin, dem-dezgeh û serokên xwe rexne bikin. Bila karîkatorîstên me bikaribin, karîkatorên rêxistin û serokên me çêbikin. Nivîskar û hunermendên me bikaribin rexneyên xwe yê edebî û siyasî bikin. Ew bi xwe jî bikaribin rexne li berhemên hev û du bigirin ku di civata me de geşbûn û pêşketin çêbibe. Tolerans û bêhnfirehbûn rê li pêş mirov vedike!

Gotinên Pêşiyar

Zor gizêrê radike
 Mar e, nê cih e, ne jî war e
 Tejikê maran, bê jarî nabe
 Çav ji çavan şerm dike
 Dara ku siya xwe nede koka xwe,
 xêra wê tune ye
 Diya mirovan her gav kurikan nayne
 Avê bîne ji mesîlan, qîza bîne ji esîlan
 Hem tir dike, hem jî xwe dide alî bayê
 Dî garanê de te çû kera xwe dît
 Aqilê mirov, ku jî kîsê xelkê be
 Êşa li hevala, tîra li kendala
 Mervatî nerme-nerm,
 neyartî germe-germ
 Xwedê çiya dibîne berfê lê dibarîne
 Diza ji diza dizî, erd û esman tev lerizî
 Şam dût e, qey mişar jî dût e
 Berê virê ku da bikî, wê wir da here
 Ya naçe aş, an jî ku here aş,
 gere aşvan bikuje
 Mêvan ji mêvan aciz e,
 xwedanê malê ji herduyan aciz e
 Çi tê serê quling, ji qêrîna quling e
 Malê axa diçe, canê xulam dêşe
 Aşê nezana Xwedê digerîne
 Bêlome be, bê kubarî be
 Av di golê da dimîne, genî dibe
 Keran li ba hev gire nedin,
 ji hev hînî tir û fisan dibin
 Aqilê sivik barê giran
 Ê ku çû medin dû
 Ji bona nefîsê, xwe diavê hepsê
 Cihan ava ye, herkes bi aqilê xwe şa ye
 Keys bû keys, wê gago bibe reîs
 Gundê rûbar, qereqol ne lazim e
 Av di cihê zirav de vediqete
 Diranê belengazan di plorê de dişkê
 Mêrxas dimire nav dimîne,
 ga dimire çerm dimîne
 Qey ga dike, ga dixwe
 Şîrê kerê çiqas pir be dîsa ji ceşka
 wî re ye
 Golikê malê ji gayê malê natirse
 Devê xelkê doxîna mirov nîn e
 Sal bi sal xwezî bi par
 Kulek bêdû nabe
 Goşt bêhestî nabe
 Heta raşt geriya, derewê dewsa wê-girt
 Gûyê hişk bi mirov ve nazeliqê
 Mala dîlanê nizane, radihêje
 kevçiyê xwe baz dide
 Xwedê nokan dide mirovê bêdiran
 Berxê xelkê di kozika mirov de
 nabe beran
 Dest dest dişo, dest vedigere
 dest û ser çavan dişo
 Nokê, wê bê li kokê
 Roja teng mirov ji yarê diya
 xwe re dibêje bavo
 Ji kerba dijmin mirov kêlek xwê dixwe
 Erdê neyaran bi bihusta hatiye pîvandin
 Kustiyê di ber xelkê de
 Tu kevir biavêje cewrikê xwe,
 wê xelk gomê bavêje
 Mirov diz be, şevrêş pir in
 Berxê sêwî nabe beran
 Birîndar bi birîna xwe zanin
 Ji qijikê qelê çênabe
 Serê ku neşe potik lê girê nedin



Xêr dibe xiyar, dikeve qulika dîwar
 Pîrê nemre bihar tê, kero nemire gîbar tê
 Aqil tacê zêrîn e, mixabin ne
 li serê her kesî ne
 Mirtib di zîmê de ji hev û din tîr dibin
 Mirov bikeve dîlanê, lazime ku
 mirov xwe bihejîne
 Hevsarê mirov ku di destê xelqê da be,
 ku da kaş bikî, wê mirov wir da here
 Çêlekeke bi rêx, navê garanekî
 xera dike
 Hesp ji eyarê xwe dihire
 Aşê xerabe, arvan nahêre
 Çiya çiqas bilind be jî, ewê rojekê
 rîya mirov pêkeve
 Kingê ku ti çû tendûrê,
 nanekî zêde bide nanpêja
 Xalê Xidir e, her roj li vir e
 Li bajêr bêrez, li gund bêpez nameşe
 Ji gostê ber diranan, mirov tîr naxwe
 Kîndê tu ne kundê şabûyî,
 bişewite mala xwediyê tunebûnê
 Kaniya zêran tê birîn, mala mêran

nayê birîn
 Min ne jê ye, ne jî pê ye
 Ne xir e, ne cir e'
 Tirba ku mirov ji hevalê xwe re bikole,
 mirov dikevê
 Dê bû damarî, bav bû filê kavari
 Ku ez hatim ber deriyê te,
 tu kûçikê xwe berî min de
 Bav ber bi zarûk tê, zarûk ber bi çiya de
 Li zikê wî xistin, gote ax pişta min
 Mirov bi cêrê xelqê naçe aş
 Mirov siwarê hespê xelkê be,
 wê zû jê peya be
 Kapê mirov her gav mîr nayê
 Gotina xweş ji qulê dikşîne marê reş
 Zimano leqeleg, seriyo teqereq
 Were vî kerî jî vê avê derbas bike
 Bela mirov ji binê piyê mirov dertê
 Nehînkirina hîn neke,
 ku te hîn kir ji bir neke
 Siûd ji aqil zêde ye
 Dixwim nan û avê,
 nakşînim mineta dê û bavê

Sê ker hene li dinê, yek jê mihê dide bi
 bizinê, yê duduya genim diavêje şûna
 kizinê, yê sisiya mala xwe
 dibe rûmala bavê jinê
 Go pişo gûyê te derman e,
 gote nexêr huburman e
 Go pişo diya te baş e an bavê
 te gote new û new
 Çav kulbûn ji çavkorbûnê çetir e
 Însanê nezan ji dijmin xerabtir in
 Bûka fedyok bi gundekî,
 mêrê fedyok bi kundekî
 Mirov ji koran re çira vênaxe
 Cahşikekî mirov hebe,
 barê mirov li erdê namîne
 Bira rê be, bira dût be
 Bira qîz be, bira pîr be
 Qîza revandî, mîna rûnê helandî
 Bi gayekî narim cem axakî
 Mirov deva xwedî bike, gerek serdarê
 mirov bilind be
 Bira barek genimê mirov hebe,
 barek zêrê mirov tunebe
 Zavayê li ser xezûran,
 sêwiyê li ser tenûran
 Mirov hevalê mirîşkê be,
 wê her tim nikulê mirov di gû de be
 Kûsî ji qalikê xwe dertê,
 tû dike qalikê xwe
 Bira çêlek avis be kingê za
 Kî çî dike, dîsa bi xwe dike
 Bira mirov ne sêwiyê berdestan be,
 bira pepûkê ser çiya be
 Bistîne ji deriyar, bide xêra miriya
 Rûviyê gerok ji şêrê nav mala çetir e
 Dilê şivan bixwaze, kare ji nêrî şîr bîne
 Ji hinekan re deşt e ji hinekan re jî teşt e
 Baş di me nagerin, pîs jî ji me nagerin
 Heta dilê dê nekevê, qîzê-nade
 Kevirê havînê bavê kulînê
 Rûvî çiqas kone be, bi gunê xwe
 dikeve qefê
 Çavê şilopî ji çavê kor çetir e
 Çiya bêdar nabin, gelfî bêav nabin
 Morîka qul bi etaran re namîne
 Lêv ji diranan pêştir e
 Serê du beranan di dîzikekî de napije
 Mirov ji hevalê xwe re kerê bixwaze,
 ji bona ku Xwedê hêstir bide mirov
 Dinya nediye, savar pat, got îro
 îda me ye
 Kî bûk be, ew berbûrî ye
 Nalê bêtapî, jina bê qeyd ji xwe re,
 nehesibîrî
 Sala di bihar, jina kofî xwar,
 pê neyne itbar
 Dizê bostana derdê zivistana
 Dîlan herikî, beburi hetikî
 Hesp tune ye, afir çêdike
 Mirov çiqas gû tev bide,
 ewê ewqas bîn bide
 Lome ya rû ye, yan jî li dû ye
 Jina tiliyê, derdê hewiyê
 Ne li mino, ne li ber kûçikê mino
 BERHEVKAR:
 ŞAHABETTİN KARAKUŞ

Gelperwerî û Nîjadperestî

Bi derketina rojnameyeke kurdî pişt re jî pirtûkên bi zimanê kurdî hatine weşandin. Ji çirokan bigire heta roman û pirtûkên ku ji kilasîkê cîhanê hatine wergerandin û pirtûkên ku li ser dîroka kurdan, edebiyata kurdan li bakurê Kurdistanê bi zaravayên kirdkî, kurmancî hatine

weşandin. Gihîştina vê merhaleyê ew qas hêsan nebû, lê wisa xuya ye ku di rojên pêş de wê çand û edebiyata kurdî di qada navneteweyî de cih bigire. Di demeke kurt de ew qas pêşketin helbet baş e, lewre berhemên ku têne weşandin jî divê layîqî vê pêvajoyê bin. Ango ew berhem bersiv nade demê, yanê ji berhemêke nivîskî nabore. Divê bi her awayî ve li ser kûr û dûr bê rawestîn ji bo ku bi berhemek, di pêserojê de ji kurdan re bikaribe ferhenga toreya kurdî dewlemend bike.

Ji destpêka şoreşê ta niha pêşketineke di zimanê kurdî de derkete holê, berê tu insan bi xwe bawer nedibûn ku pirtûkan binivîsîn, lê îro her kesê ku di vê qonaxê de gihîştine, vê kêmasiyê bi awayekî dadigirin.

Her wiha mijareke ku heta niha

ji aliyê olî ve li ser nehatiye rawestî 'Di ola îslamê de cihê nijadperestiyê û gelperweriyê' di berhemêke ku bi kurdî hatiye nivîsîn de derkete pêşberî me.

Pirtûk ji aliyê Xwediyê Rojnameya Azadiya Welat Celalettin Yöyler ve bi navê 'Gelperwerî û Nîjadperestî' bi keda xwe hatiye weşandin. Pirtûk di bin pêncî û du sernavan de li ser nijadperestî, gelperwerî û mijarên di ola îslamê de bi awayekî cihêreng radiweste. Ev mijarên heta vê gavê pir li ser nehatiye axaftin, bi ayetên Quranê hatine rave kirin. Mafên gelan û pêwistiya têkoşîna li dijî bédadiyê bi ayetên Quranê hatine selmandin.

Ji bilî mijarên ku me li jor destnîşan kirin, nivîskar mijarên wekî nimêj, destmêj, rojî û qurbanê jî hildide dest û wan jî bi awayekî giştî hem jî bi zimanê kurdî dinirxîne.

Her çiqas pirtûk bi zimanekî herêmî hatibe nivîsandin jî, pêwist e mirov wê bixwîne û binirxîne.

Pirtûk ji aliyê nivîskar ve hatiye çapkirin, yanê ne bi riya çapxaneyê û navê nivîskar jî, li ser xelet hatiye nivîsandin, ev jî kêmasiya amadekarên pirtûkê ye.

SERWÎSA ÇANDÊ



Hejmara nû ya Nûbiharê

Kovara kurdî ya mehane Nûbihar bi hejmara xwe ya 51-52'yan derket pêşberî xwendevanan. Di pêşgotina kovarê de tê gotin ku ji ber hinek egeran hin caran kovar bi derengî derdikeve û hin caran jî du hejmar bi hev re derdikevin. Her wiha îcar jî du hejmar bi hev re hatin weşandin.

Her wekî hejmarên berê yên kovarê, îcar jî mijareke sereke hatiye neqandin. Ev nivîsa li ser vê mijarê jî bi sernavê "Zora ihtiyacan li ser mirov" jî hêla Ali Karadeniz ve hatiye nivîsandin. Di vê nivîsê de pêwistiya ravekirina reng û sînorên pêdiviyên hatiye xwestin. Nivîskar dide zanîn ku bi pêdiviyên mirovan tê liştin, lewre jî dema pêdivî ne diyarkirî bin, mirov dibê koleyê pêdiviyên.

Digel vê nivîsê gelek nivîsên cihêreng di vê hejmara kovarê de cih girtine. Tevî nivîsên kurmancî helbest û nivîseke bi kirmanckî (kirdkî) jî di vê hejmara Nûbiharê de cih girtine.

Zimanê kovarê bi giştî rawan û xweşik e, lê pîrbûna peyvên bi erebî û hin çewtiyên rêzimanî wekî kêmasî balê dikişînin ser xwe.



Tiştik miştikên vala

HELÎM YÛSIV



Ji tiştên seyr yek, di civaka me de tîkiliya gel bi pirtûkê re ye. Piştî van guhartinên mezin li cîhanê, di civaka me de jî gelek guhartin di bîngeha avahî û hestên me de peyde bûn. Di vê dema dawî de pirtûk bûye kesekî biyan di civakê de, her wiha bûye bar ji xwediyê xwe re. Gelek jî kesên ku li pirtûk û kovaran xwedî derdiketin, niha jî xwe û zarokên xwe pê ve li tu tiştî nabin xwedî, pirtûk û kovar û rojname spartine şewatê, bi serbilindî li dijî çand û torê û huner disekin, heta ku van rojên dawî tu dikarî şefeqet û tinaziyê di çavên kesên hawirdora xwe de bibînin, bi çavekî kêr li kesên ku heta niha li ser serê xwe siwar bûne û dixwînin û dinivîsin dinêrin, ku li gelek cihên wilo tu li vê pîrsê rast tî: "Em ji kê re dinivîsîn kî dixwîne? Haya kê jî xwendinê heye?" Ez bi xwe nema heyirî dimînim ji van bûyerên rojane, lê pîrs di destê mirov de şîr tî. Mînak, li rûniştineke partiyêke kurdî, piştî gotina xwe kirin, berpirsiya partiyê xwest

her yek ku pîrsa wî hebe li ser rûpelekê binivîsîne, bi vî rengî bi dehê pîrsan çûn ber destê wî, piştî çend pîrsan, li rûpelekê xerîb rast hat; vî xortî (xwediyê rûpel) pîrsa xwe bi kurdî nivîsandibû. Vî berpirsê partiya kurdî ya (pêşeng û welatparêz û xwedî dîrok û...) ku ev du saetên wî li ser kurdîyê û zimanê kurdî û dîroka kurdî dipeyive, nizanûbû ew pîrs bixwenda, çimkî ne bi zimanê biyanan bû, êdî ka emê çî bikin ji van partiyên wilo? Pîrsa min ew e: Çend kesên di serokatiya partiyên kurdî de cih girtine û nizanin bi zimanê xwe bixwînin.

Seranserê partiyên kurdî li Başûrê Biçûk (tevde) bi zimanê erebî belavokên xwe yên siyasî diweşînin û doza zimanê kurdî dikin!.. Ji bo ku em ji babeta xwe dûr nekevin ezê vê bûyerê bînim zimên. Heft sal derbas bûbûn ku min û hevaleyê xwe hevdû nedîtibû, ez û wî li ser eynî rûniştokê û li eynî dilbistanê me dixwendin wekî hemû xortên nûhatî li Amedê û (wê çaxê) wî jî helbest dinivîsandin, min jî çîrok; zêdeyî şevbuhêrkekê me bi hev du re çêkiribû, piştî kutakirina 'lîse' yê, her yek ji me bi deverêkê de teriqiya û me nema hev û du dît hetanî berî çend rojan, ez ji pirtûkxaneyê derdiketim, min rojname vekiribû û li kolanê min dixwend; ji nişka ve, ji piştî min de dengê kenekî bilind, ez zivirîm; hema min dît hevalê min î kevin xwe avêt lep û rûyê min û dikene û her dikene û

ken betal nake. Ji kêfa re destên xwe li hev dixistin û digot:

-Te hîn dev ji van tiştik miştikên vala bermedaye?

-Na bi xwedê.

Tu hîn nezewiciyî, tu hîn bêmal î, bêkar î, bêpeyv î?

-Erê.

Te hîn xwendin xelas nekiriye?

-Na.

Tu çima ji van welatan narevî?

-Nizanîm.

Tu çî ecêb î yaho!

Ez mat mabûm, min lê dinêrî hevalê min xweşik bûbû, qelew û rûgeş bûbû. Tîq tîqa wî nesekinî. Ji min re got:

-Tu zanî çima ez ew qasî dikenim?

-Na.

-Meteloka diya min tê bîra min.

-Meteloka çî?

-Emrê reqê çû bi teqereqê.

Min dolaba peyvên bi aliyê wî de gerand, vêca min ji wî pîrsî:

-Ez û hel... çî?

-Hel... hela de dev ji me û van tiştik miştikên vala berde lo!

Hevalê min bikêf berê xwe da mala xwe ya nû avakirî, min jî bi êş berê xwe da maleke xerakirî û bêkes.

Lajek û zewjiyayin

Sûkta Çermûg de, jew mêrdek esto. No mêrdek şewra rew werzeno, nimazê xo yê şewray keno û şino qahwe. Qehwe de xortan, arêkeno çosme dê xo û înan kuşet keno. No fina rojê şino qehwe wija xortan arêkeno çosme dê xo û jew dê înan ra vano: "Yilmaz ti biyê gird, ti yê çî ra nêzewjiyênê?" Yilmaz vano: "Xalo ezo wazena bizewjiyî, la belê piyê mi no, mi nêzewjînenê, ezo jî şermayena pêrdê xo ra vajî, mi dest bo se, ez ewro zewjiyena." Mêrdek vano: "Bewnê, ez jû ray bimûs nî şîma la belê kesî ra mevajê min vato". Xortî pêro jû fin ra vanê: "Temam xalo, ti ma rê vaj, ma kesî ra nêvam." Xalo vano: "Bewnê xortê delalî, şîma ke şand şiyê keye, maya şîma ke, nan (werdin) ard, ê nanî mewrê û jû pay piro dê û vajê şîmayê nêzanê nan bipewjê, nêzanê se, cîranan ra pers kirê û bimûsê. Fina badê naniya vajê mi rê, sardo rew soba cifinê. Wexto ke, soba rind kewna ci, jû pay sobaro dê û vajê na sobawa rind germ nêkena, ma rê sobawa rind bigirê. Fina wexto ke, şîma kewnê, werxanî xo sera çekrê (berzê) û vajê ke, no werxano mi germ nêkeno, mi rê, jew wergan diha biyarê. Ne jî nê bê se, şew werzê nemniyê (postalê) pêrdê xo, nemnî dê marda xo sero ronê û mix kirê, yan jî lawa girêdê. Şîma ke wina kerd,ê fahm kenê, şîmayê zewaj wazenê û coka şîma ra pers

kenê û şîma zewjînenê. Wexto ke, no merdek nînan vano, la jê nê merdekî jî wija beno. Lajê merdekî jî, çim vardawo dedkeynerda xo û zerya cina veşana. Qandê coya lajek nînan eşneno û xo minyan de vano. "Ez ke şand şîya keye, nînan bikrî, mi ke nê kerdî piyê mi, mi zewjînenê". Senî ke, beno şan, no lajek şino keye û peyra jî piye ci yeno. Ewnenê keye de germiya pirîncî û kerg nawa ser, hema maya lajekî sofrî nana ro, kerg û germiya pirîncî ana. Hema piyê lajekî vano: "Elî, bê ma nanê xo bûm, şîm alefê dewarî bidim ci". Lajek hema nişeno ro û jû koçik kerg beno xo fek û hema werzeno pay jû pay dano kerg ro û jû pay dano germî ya pirîncî ro û vano. "Şîmayê ne zanê kerg, ne zane germî bipewjê, nêzanê se cîranan ra pers kirê û bimûsê, ez nînan nêwena" vano û şîno mînderî sero nişeno ro. Hema piyê lajekî werzeno û şîno ode dê bîni de, nanê xo weno û şîno alefê dewarî bido ci. Ewneno, fina vengê Eliyo yeno, ûwo vano: "Mi rê sard o, rew na soba cifinê". Hema maya lajekî şîna kolî û çarî ana soba finena ci. Senî ke, soba rind kewna ci, lajek jû pay dano sobaro û vano: "Na sobawa rind germ nêkena, ma rê, jû sobawa rind bigirê". Wexto ke, no pay dano soba ro, keverê soba şîkyeno adir wejyeno tever, mînder

û yolixa kewna ci, la belê maya lajekî zorna adirî kena hewna. Piyê lajekî alefê dewarî dano ci û yeno ode xo de nimazê şanî bikro, hema maya lajekî yena û vano: "Mêrdek se biyo nê lajekî, no bi xînt se bi?" Mêrdek vano: "Cenyekî vind nimazê xo bikrî, bado kisey bikim." Mêrdek, nimazî xo qedînenê, nê kenê ke, kisey bikrê ewnenê vengê lajekîyo fina yeno, hema maya lajekî şîna vana "xeyro lajê mi sebyo to?" Lajek: "Hewnê mi no yeno, doşegê min rake." Maya lajekî hema doşegê lajekî ana kena ra û şîna ode dê xo mêrdekê xo ra vano: "Mêrdek sebyo nê lajekî, no xînt mebo, bê ma ney bem doxtorî." Mêrdek: "Ez ke şewrayan şîna qehwe, xortan arêkana çosme dê xo înan kuşet kena, û înan rê istanikî vana. Mi ewro jî qehwe de kuşeta Yilmazî ra vat: "Ti biyê gird, tiyê çîra nêzewjiyênê." Ey jî vat: "Ezo wazena bizewjiyî la belê piyê mi no, mi nêzewjînenê, ezo jî şermayena vajî". Mi jî ey ra vat: Wina wina biki, to ke wina kerd, ê fahm kenê tiyê zewajî wazenê qandê coya tora pers kenê û to zewjînenê. Wexto ke mi nê vatî Elî jî wija bi. Mi Yilmazî ra se vat (çi-çi vatî) Eliyo înan keno." Jew nemnî mendî. Eke Elî nemniyanê ma jî mix kiro se demek oyo zewaj wazeno. Barê şo, ê nemniyanê ma nêwîyan hewadi, nemniyê newey tewa mebê. Hema maya la-

jekî werzena şîna nemniyanê newiyan nimnena. Şew lajek werzeno ewneno nemniyê newey nimnayê, no geyreno nemniyanê newiyan vînenê û ano eywan de hem mix keno û hem jî kabloya girêdeno û kewerdê perdê xo verd nana ro. Şewra ezan veyn dano, mêrdek werzeno nimaz bikro ewneno lajekî nemnî hem mix kerdê û hem jî kabloya girêdayê. Mêrdek: "Hema veyndeno marda lajekî ewneno cenyek ra vengo nêwejyeno. No hema hêrs beno destê xo çekeno ling da cenyek, ewneno cenyeka vana: "Kam zawa, kam zawa Elî zawa hala hala hey". Mêrdek vano: "De werzi cenyekî, çi tiya çi zewajo de werzi: Cenyek: "Sebyo mêrdek, to hewnê mi hermina mi hewno çi weş dî, ma Elî zewjiyayê". Mêrdek: "Mi to ra vat nemniyanê newiyan hewadi, barê nemniyê newey tewa mebê, la belê to nêhewadayê, Elî nemnî hem mix kerdê û hem jî kabloya girêdayê". Maya lajekî: "Mi nemnî hewaday bî, demek geyrawo diyê." Mêrdek: "Şo Elî ra vaj oyo kamî wazeno, çim vardo wo kamî, ma şîm ci rê biwazim." Maya lajekî şîna perskena lajek vano: "Mi rê keyna dedê mi biwazê, nê şînê keynek wazenê lajekî zewjînenê, ci rê hîre roj hîrê şewî veyve kenê. Mêrdek jî a saet ra tepya, qahwî viradeno.

MEMED DREWŞ

BIXELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (71) XAÇEPIRSA

Mêrdek	N	Ç	A	A	Ş	Pîngîk
Hewreyî	H	E	S	E	N	H
Şîma	T	G	M	A	T	P
Perşî	P	E	R	Ç	E	Ş
Şîma	W	A	N	T	A	J
Kerşî	K	E	N	I	N	K
Şîma	Y	I	O	M	I	D
Derveyî	T	E	V	E	R	I
Mêrdek	M	I	R	R	A	N

PEYVA VEŞARÎ → TAHŞINTAŞA

Bersiva Xaçepirsa 69'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 71'ê Pirtûka "Încila Yûhenna" ye **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.




Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 69'an kasete Ferhat Tunç 'Kayıp' qezenc kirine. **Abdulkadir Cengiz/ İskenderun, Ruhai Akyıldız/ İzmir, Yılmaz Demirci/ Mêrdîn, Mehmet Reşat Akyüz/ Amed, Ferhat Dengiz/ Edene**

Kesê cahil	7	Cureyekî narkotikê	Bl erebî ez	Li derveyî din bûn	Notayek
Hunermen dek (wêne)	7	Unsur	6	Méyweyek	Rîba
Madenekî giran bûha	3	İrani	Elementa (N)	Serwaxt ktrin	Teni
Fikir				Nav, deng	Navê ajansekî
Nazik		2		Nexwaşiyek	Tipek
Sembola potasyûmê		(berevajî) Xerabeyên li Qersê	Çeşme Glyayekî ku tê xwarin	Naverast	Pîlakaya Tirkîyeyê
Rewşenbîrê qaşo		Naverok		Xwerde paşa daçekê Pif	Pismamê Hz. Mihemed
Sembola Tungestênê		Tipek	Heywanek		
		Giyani		5	

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7



Berdevkê Komîteya Navendî ya PKK'ê Halil Ataç:

Em di şer de serkeftî ne

Berdevkê Komîteya Navendî ya PKK'ê Halil Ataç, li Paytexta Lubnan Beyrûde civîneke çapemeniyê li dar xist û agahiyên girîng li ser şer dan. Halil Ataç diyar kir ku ew, şer bi serkeftin didomînin û dewleta tirk xistine nava avzêlêke kûr. Ataç da xuyakirin ku dagirkirina dewleta tirk bi îtifaqa Îsraîl tê meşandin û Îsraîl niha jî dixwaze ji paş ve li welatên ereb bixe. Her wiha li gorî gotina Ataç ku Îsraîl Amerîka û Tirkiye dixwazin hêzên xwe bikin yek.

Berdevkê Komîteya Navendî ya PKK'ê Ataç da zanîn ku gerîla di şerê ku 13 sal e didome de gelek tecrûbe qezenc kirine. Û wiha berdeyam kir: "Em baş dizanin çawa şer bikin, derfetên me yên îro ji her demê zêdetir in û em bi van îmkanan dikarin şer bi xurtî berdeyam bikin.

Halil Ataç di hefteya duduyan a şer de rewşa artêşa tirk jî nîrxand û wiha got: "Dewleta tirk ber bi hilweşînê ve diçe. Ji ber vê sedemê ye ku giraniyê dide şerê pîskolojîk. Em dikarin bibêjin ku ew di vî şerî de ji niha ve têk

cûye. Dewlet hejmara der barê kuştinên xwe de jî dide xuyakirin ku wan serkeftineke sexte bidest xistiye."

Her wiha Ataç bilançoya şer a meha gulanê jî çapemeniya cihanê re diyar kir. Li gorî bilançoya şer, di meha gulanê de li Bakur 75 û li başûrê Kurdistanê jî 37 gerîla di şer de giyan dane. Di şer de 791 leşker ceş û PDK'yî hatine kuştin. Ji wan 3 serbaz, 1 başkomser, bi tevahî 18 serbazên ji rutbeya bilind hatine kuştin. Hejmara birîndarên leşker, ceş û PDK'yî yan 591 in. Di nava vê mehê de, bi beşdarbûna gelek balafiran 57 êrişên hawayî pêk hatine.

Di encama 196 çalakîyên gerilayên ARGK'ê de 13 tank û panzêr hatin rûxandin. Tenê di meha gulanê de 311 berendamê gerîla tevî refên ARGK'ê bûne.

Halil Ataç, Amerîka Îsraîl û Tirkiye jî wekî hêzên herî terorîst ên cihanê nîrxand. Ataç da xuyakirin ku heke wiha here, wê di nava hedefên wan ên leşkerî de berjewendiyên Îsraîl û Amerîka jî cih bigirin û li ser vê mijarê jî

wiha got: "Van dewletan her tim êriş birine ser têkoşîna rizgariya neteweyî ya gelên bindest. Eger ev dewlet, siyaseta xwe ya qirêj li dijî gelê kurd berdeyam bikin, gelê kurd wê reaksiyoneke tûj nîşanî wan bide."

Her wiha Ataç daxuyand ku tûrîzma tirk jî di nav hedefên wan de ye. Wî da xuyakirin ku tûrîzma tirk şerê qirêj finanse dike. Ji ber vê yekê bila kes ji windayiyên ku di encama êrişan de, dê çêbibin, me berpîrsiyar negi-



Eyy!
Lawê kurd ê por spi yê birûmet
Hezîran têrî biranîna te nakin
Tu bûyî evîn, bûyî çem herikî
nav behrên welatê min ê xwînî

Mêrxasiya te têra dilc nake
Ji deman serê havînê,
gule rika te, jiyana berxwedana te ye
Navê te ji biratiyê re, ji şoreşê re
Navê te ji aştiyê re dawet, ji mirovatîyê re bang e

Muhsîn Melik û Mehmet Ayyıldız di 2'ye pûşpera 1994'an de di germahiya havînê de hatin qetilkirin.
Têkoşîna wê, rîya me ronî dike û ez tevahiya şehîdên şoreşa Kurdistanê bi bîr tînim.
Birayê te Fevzî Melik



alozkî: tevlihev, komplîke
asêkirin: girtin
bador: tesîr
belam: lê belê, feqet
berê: enî (cephê)
bêhempa: bêemsal
bêdoza fermî: îdeolojiya fermî
cerdevan: korucu
çîna karkeran: işçi sınıfı
darizandin: Mehkemekirin
demsal: werz (mevsim)
Derfet: îmkân
desthilatdar: kesên xwedî îqtidar


Ferhengok

bertek: reaksiyon
dijber: muhalîf
dîrav: pere
dubendî: cudatî
erênî: pozîtîf
rêbûn: hînbûn, elimandin
girse: cemawer
kambax: xerab, berbat
karsaz: karbidest (işadamı)
kedkar: emegdar (emekçi)

kemirî: kewizandî
kutakirin: qedandin, xelaskirin
mînak: nimûne (örnek)
moşek: fuze
nehênî: veşarî, dizkî
nemaze: bi taybetî, nexasim
nêzîktêdayîn: yaklaşım
pejirandin: qebûlkirin
pejinkar: hesas
pêbirk: pêşbazî (yarışma)
sûde wergirtin: fêdegirtin
zivêr: aciz

Nivîskar û Sendîkavan Tayfun İşçi:

Hinek çepgir cesaretê didin MGK'ê



Gelê tirk ji Bosna û Filîstîne sûde werdigire. Lê, ji bo ku bi kurdan re bi hev re dijîn û kurd di destê wan de ne, ji bo kurdan armanca wan a sereke perçiqandina kurdan e. Gava ku yekîtiya neteweyî hat rojevê, hemû rêxistin û partiyên wan tèn cem hev. Tevgera şoreşger a Tirkiyeyê di warê şikênandina tesîra şovenîzmê û dijberiya şerê qirêjî de bi ser neket. Divê em vê yekê qebûl bikin.

Berî vê bi demê li Brîtanyayê Sendîkaya Neteweyî ya Mamosteyan ji bo şermezarkirina şerê qirêjî biryara protestokirina turîzma Tirkiyeyê girt. Her wisa hin karkerên limanan jî ji bo çekên ku wê herin Kurdistanê biryara lêbarnekirî standin. Lê, rêxistinên çîna karkeran ên tirk heya vê demê xebateke bi vî şeweyî pêk neanîne. Bervajî vê yekê hinek sendîkayên karkeran li dijî hêzên îslamî û tevgera kurd bi karsazan re hevalbendiyê dikin û piştvanîya xwe ji bo biryarên MGK'ê diyar dikin. Li ser vê rewşa kambax me hin pirs arasteyî kes û nûnerên hin saziyan kir.

Nivîskar û sendîkavan Tayfun İşçi li ser pîrsa der barê helwesta çîna karkeran û pêşengên wê daxuyand ku, bi dagirkirina herêmên kurd ên li bakurê Iraqê kêşeya kurd bûye navneteweyî û nişaneyên şerê herêmî xwe didin der. İşçi wiha axivî: "Di rewşeke wiha de, hêzên kedkar mixabin ne peyînkariyê. Hêzên kedkar jî paşerojê dersan wernagirin. Rêxistinên çîna karkeran der barê dubendîya şerîtxwaz û darbexwazan de ji bo darbexwazan piştgirîya xwe ragihan-

din. Diyar e ku, hêzeke ku piştgirîya darbexwazan dike nikare ji bo gelên bindest tiştê erênî û baş bike. Her çiqas di nav girseya wan rêxistinên de komên aşîtxwaz hebin jî, serokên wan jî bo berjewendiyên sermayedaran tevdiagerin."

Nivîskar û Sendîkavan Münir Ceylan jî bal kişand ser bêrêxistinbûn û tirsonekiya hêzên aşîtxwaz û got ku hewlên aşîtxwaz ferdî dimînin. Ceylan li ser helwestgirtina DİSK'ê jî diyar kir ku DİSK'ê piştî 12'ê rezberê jî bo ku bi rejîmê re li hev were bi şeweyekî nehênî nasnameya xwe ya çîneyî înkariyê Ceylan wiha berdewam kir: "Lê êdî ev nêzîktêdayîn terikand. Ez dikarim bibêjim, DİSK bi kirîna xwe yê dawîn bû rêxistineke rejîmparêz. Niha bi TÛSİAD û TÜRK-İŞ re ketine milên hev"

Gerîndeyê Giştî yê Weşanê yê Rojnameya 'Özgür Atılım' Halil Dinç da zanîn ku digel ku çîna karkeran ya Tirkiyeyê jî ber şerê qirêjî êş û zehmekê herî mezin dikşîne jî, li dijî vê yekê helwesteke cidî nişan nade. Her wiha Dinç bal kişand ser bêhêzbûna tevgera şoreşger a Tirkiyeyê û wiha berdewam kir: "Tevgera şoreşger a Tirkiyeyê di warê şikênandina tesîra şovenîzmê û dijberiya şerê qirêjî de bi ser neket. Divê em vê yekê qebûl bikin. Ji ber vê yekê çîna karkeran li dijî şerê qirêjî tiştê cidî nake."

Ji aliyekî din ve helwestgirtina rêxistin û partiyên çepgir piştî dagirkirina başûrê Kurdistanê bi awayekî zelaltir xwe da der. Bi taybetî di mitînga ÖDP'ê ya Sultanahmetê de alîgirên partiya navborî yuh li alên ERNK'ê barandin û rêberên vê partiyê derbarê dagirkirina başûrê Kurdistanê de tiştêk negotin.

Wekî her car daxuyaniya balkêştirin Serokê Partiya Karkeran (İP) Doğu Perinçek da. Li gorî vê daxuyaniyê "Mitînga ÖDP'ê li dijî artêşê ye." Li ser vê yekê Tayfun İşçi bal kişand ser mitînga dawî ya ÖDP'ê û da zanîn ku çepgirên tirk jî kedkaran qetiyên e û bi kirîna xwe cesaretê didin hêzên darbexwazan. İşçi wiha peyivî: "Partiyên ku xwe wekî sosyalist û şoreşger bi nav dikin di mitîngên


xwe de sinyalan didin van hêzan. Ji aliyekî ve jî, ew derdor jî bo birîna dengê kesên ku dixwazin kêşeya kurd bi riyeke aşîyane çareser bikin, hewl didin xwe." Münir Ceylan jî der barê vê mijarê de daxuyand ku, hêzên çepgir yê ku ji bo çareserîya kêşeya kurd tê dikoşin jî dil û cidî xuya nakin. Li ser heman mijarê Gerîndeyê Giştî yê Atılımê Halil Dinç jî diyar kir ku, dagirkirina Başûr jî bo hêzên çepgir û şoreşger azmûneke girîng e û gotina xwe wiha domand: "Xuya ye ku dengê kes û rêxistinên ku li dijî vê dagirkirîna derkevin wê bê birîn. Ji ber ku Başûr jî bo hêzên împeryalist û Tirkiyeyê gelekî girîng e." Her wiha Dinç diyar kir ku bi nêzîktêdayînê aşîtxwaz kêşeya kurd çareser nabe. Bi tenê, wê bi geşkirin û xurtkirina têkoşîna azadiyê çareser bibe.

Mebûsê RP'ê M. Fuat Firat: Refah ne desthilatdar e

Li aliyê din ne tenê helwesta derdorên çepgir û çîna karkeran her wiha bêdengiya derdorên îslamî jî balkêş e. Lewre artêşa tirk rasterast wan wekî dijmin nişan dide û her wiha dagirkirina başûrê Kurdistanê jî bi hevalbendîya Amerika, Îsraîl û Tirkiyeyê li dijî gelên herêmê ye û bi piranî misilman in.

Mebûsê RP yê Erzeromê Mehmet Fuat Firat der barê helwesta îslamiyên Tirkiyeyê û birêvebirina RP û dewleta tirk de daxuyaniyên gelekî girîng û balkêş dan. Firat diyar kir ku rewşa rojhilatê gelekî kambax û perîşane û got, ji bilî duakirîna tiştê ew karibin bikin, nîn e. Fuat di dûmahîka axaftina xwe de wiha got: "Heya îro li dijî şerê qirêjî dengeke bi cesaret derneket. Hê jî xuya nake. Heke hêza me hebûya, me dikaribû van pirsgerîkan çareser bikin."

Firat da zanîn ku jî bo fêmkirina helwesta derdorên îslamî fêmkirina bandora îdeolojî ya fermî pêwîst e. Paşê wî da zanîn ku gava ku behsa yekîtiya neteweyî dibe hemû tirk tèn cem hev. Fuat Firat wiha axivî: "Gelê tirk ji Bosna û Filîstîne sûde werdigire. Lê, ji bo ku bi kurdan re bi hev re dijîn û kurd di destê



TAYFUN İŞÇİ.

wan de ne, ji bo kurdan armanca wan a sereke perçiqandina kurdan e. Herçiqas ew kesên ku ji bo îslamiyê canê xwe didin xwe wekî misilman bi nav dikin jî, îdeolojiya fermî di şexsiyeta wan de wekî nexweşiyekê cih digire. Gava ku yekîtiya neteweyî hat rojevê, hemû rêxistin û partiyên wan tèn cem hev."

Firat li ser helwesta RP'yê ya ji bo dagirkirina başûrê Kurdistanê jî bal kişand ser desthilatdar nebûna RP'ê û got RP hukûmet e, lê ne desthilatdar e. Fuat Firat got: "Haya hukûmetê ji operasyonê tune bû." Ji bo helwestgirtina mebusên kurd jî Fuat Firat bi şeweyekî xemgîn wiha axivî: "Tiştê ku em bikin wê bi kêrî çî were? Ku em bikin jî, wê kilîdekê li devê me bixin! Mixabin me jî ji bo şermezarkirina vî operasyonê tiştêk nekir. Em di nav xwe de dipeyivin, em ji wan (RP'yan) re dibêjin, "ev ne tiştê baş e û neheqî ye. Jixwe rewşa şirkê me jî diyar e. Hemû kes û komikên şerperest û mîrkuj di nav wê de kom bûne!" Firat operasyon jî wekî operasyoneke ji her alî ve ji bo berjewendiyên siyonîzmê nixand.

MAZLUM DOĞAN



MÜNİR CEYLAN